



Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

ZIMANÊ KURDÎ, MALBAT Û ZARÊN WÎ
KURDISH LANGUAGE, ITS FAMILY AND DIALECTS
Hewa Salam KHALID

XEBATÊN AKADEMÎK YÊN KURDOLOJİYÊ LI TURKIYÊYÊ (2009-2019)
ACADEMIC KURDISH STUDIES IN TURKEY (2009-2019)

Resul Geyik, Esat Şanlı, Roger Acun, Ruken Çalıştıran Karabat, Ahmet Kan, Veysel Yıldızhan

BERAWIRDKIRINA ÇÎROKA ELİK Û FATİK A KURMANCÎ Û HANSEL Û
GRATEL A BIRAYÊN GRIMM -LI GOR MOTÎF INDEKSA STITH THOMPSON
THE COMPARISONS OF THE TALE OF ELİK AND FATİK IN THE KURMANCİ
DIALECT OF KURDISH AND TALES OF GRIMM BROTHERS HANSEL AND GRATEL
-IN ACCORDANCE WITH STITH THOMPSON MOTIF INDEX
Veysel TANRIKULU

VEGÊRANA WELATPERWERÎYÊ Û FÊHMA ZIMAN DI HELBESTA
ŞIKOYÊ HESEN DE
(THE PATRIOTIC NARRATION AND LINGUISTIC INSIGHT IN ŞIKOYÊ
HESEN'S POETRY)
Ahmet SEYARÎ

NÊRÎNÊN SEREKE ÊN WERGIRTINA ZIMÊN
MAJOR VIEWS OF THE LANGUAGE ACQUISITION
Esat ŞANLI

Nasandina Pirtûkan
Çok Dilli Sözlük- Ferhenga Pirzimanî-Ferhenga Zafziwan-
Ferhengî Fireziman-Ferhenga Çend Zebane
Ahmet KAN



Uluslararası KurdiName Dergisi
Sayı: 1 Kasım 2019



International Journal of KurdiName
Issue: 1 November 2019

Kovara KurdiNameyê ya Bi Hakem û Navnetewî
Uluslararası Hakemli KurdiName Dergisi
International Peer-Reviewed Journal of KurdiName

Baş Editör/Chief Editor

Dr. Öğr. Üy. Osman ASLANOĞLU

Editör Kurulu

Doç. Dr. Hayreddin KIZIL
Dr. Öğr. Üy. Hacı ÖNEN
Dr. Öğr. Üy. Osman ASLANOĞLU

Danışma Kurulu/ Advisory Board

Prof. Dr. Abdurrahman ACAR
Prof. Dr. Hasan TANRIVERDİ
Prof. Dr. M. Edip ÇAĞMAR
Prof. Dr. M. Mesut ERGİN
Prof. Dr. Abdurrahman ADAK
Doç. Dr. Hayreddin KIZIL
Doç. Dr. Zahir ERTEKİN
Doç. Dr. Tahirhan AYDIN
Doç. Dr. Hayrullah ACAR
Doç. Dr. Ayhan TEK
Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ
Doç. Dr. Canser KARDAŞ
Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK
Doç. Dr. Mustafa ÖNCÜ
Dr. Öğr. Üy. Mustafa ASLAN
Dr. Öğr. Üy. Nurettin BELTEKİN
Dr. Öğr. Üy. Hacı ÖNEN
Dr. Öğr. Üy. Osman ASLANOĞLU
Dr. İlyas SUVAĞCI
Dr. Ahmet KIRKAN

KurdiName **Kovareke Navnetewî ya bi Hakem** e. Di qada elektronik da çap dibe. Salê 2 Jimaran (Ku hewce be zêdetir) derdixe.

KurdiName Dergisi Elektronik Ortamda Yılda 2 Sayı (Gerekirse daha fazla) Yayın Yapan **Uluslararası Hakemli Bir Dergidir.**

Journal of KurdiName Is A **Refereed International Journal** Published In Electronic Media Twice For A Year (More if necessary).

Dergimizde yayınlanan makalelerin sorumluluğu yazarlarına aittir. Makalelerin tüm telif hakları KurdiName Dergisi'ne aittir.



Kovara Kurdi nameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdi name Dergisi
International Journal of Kurdi name

Uluslararası Kurdi name Dergisi
Sayı: 1 Kasım 2019



International Journal of Kurdi name
Issue: 1 November 2019

NAVEROK - CONTENTS

ZIMANÊ KURDÎ, MALBAT Û ZARÊN WÎ KURDISH LANGUAGE, ITS FAMILY AND DIALECTS Hewa Salam KHALID	Page: 3-16
XEBATÊN AKADEMÎK YÊN KURDOLOJİYÊ LI TURKIYÊ (2009-2019) ACADEMIC KURDISH STUDIES IN TURKEY (2009-2019) Resul GEYİK, Esat ŞANLI, Roger ACUN, Ruken ÇALIŞTIRAN KARABAT, Ahmet KAN, Veysel YILDIZHAN	Page: 17-48
BERAWIRKIRINA ÇÎROKA ELİK Û FATİK A KURMANCÎ Û HANSEL Û GRATEL A BIRAYÊN GRIMM -LI GOR MOTÎF INDEKSA STITH THOMPSON THE COMPARISONS OF THE TALE OF ELİK AND FATİK IN THE KURMANCI DIALECT OF KURDISH AND TALES OF GRIMM BROTHERS HANSEL AND GRATEL-IN ACCORDANCE WITH STITH THOMPSON MOTIF INDEX Veysel TANRIKULU	Page: 49-60
VEGÊRANA WELATPERWERÎYÊ Û FÊHMA ZIMAN DI HELBESTA ŞIKOYÊ HESEN DE (THE PATRIOTIC NARRATION AND LINGUISTIC INSIGHT IN ŞIKOYÊ HESEN'S POETRY) Ahmet SEYARÎ	Page: 61-69
NÊRÎNÊN SEREKE ÊN WERGIRTINA ZIMÊN MAJOR VIEWS OF THE LANGUAGE ACQUISITION Esat ŞANLI	Page: 70-76
NASANDINA PIRTÛKAN Çok Dilli Sözlük- Ferhenga Pirzimanî-Ferhenga Zafziwan-Ferhengî Fireziman-Ferhenga Çend Zebane Ahmet KAN	Page: 77-80



Kovara Kurdi nameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdi name Dergîsi
International Journal of Kurdi name

Uluslararası Kurdi name Dergîsi
Sayî: 1 Kasım 2019



International Journal of Kurdi name
Issue: 1 November 2019

ZIMANÊ KURDÎ, MALBAT Û ZARÊN WÎ

KURDISH LANGUAGE, ITS FAMILY AND DIALECTS

Hewa Salam KHALID*

Kurte

Zimanê Kurdî yek ji zimanên Îranî ye, ku ser bi malbata Hînd û Ewropî ye. Lewma hevbeşiyên zehf di navbera Kurdî û zimanên din ên Îranî de hene. Ev wekyekî û nêzikiya navbera hinek zimanên dinê, bûye hokara destnîşankirina malbatên zimanan. Lê belê, dema yek dibêje Kurdî, dîsa ne xuya ye, ku mebesta wê kîjan zarê Kurdî ye. Çimkî zimanê Kurdî, zimanekî ne-sitandard bûye û ji çar şaxên sereke pêk tê. Ew şax jî bi zar tên binavkirin. Ji vî aliyê valatiyeke mezin heye û bandora vê valatiyê jî li ser tevahiya Kurdan çêbûye. Zimanê Kurdî grêdayî nasnameya gelê Kurd e. Lewma neteweyên dagîrker û hukimdarên axa Kurdistanê, ji bo têkbirina Kurdî hewl didin, heta bikaribin nasnameya Kurdan jî têk bibin. Vê pîrosêsa esîmilasiyonê, li gelek cihên Kurdistanê bandoreke mezin çêkiriye. Minak, li bakurê Kurdistanê jimara Kurdî axêvan kêr bûye û zimanê Tirkî di gelek warên cuda de cihê Kurdî girtiye. Ji ber vê yekê, em wek zimannasek Kurdî dimeyîzin û hewla ronîkirina rastiyên zimanewanî didin. Di vê gotarê de, em behsa malbata zimanê Kurdî, zarên zimanê Kurdî û têgehiştina di navbera van zaran de dikin û şîroveya rewşa heyî dikin. Ew jî bi palpiştîya çavkaniyên heyî û belavkirina formên rapirsî di Zanîngeha Koya de. Li gorî bersivên xwendekaran ku temena wan di navbera 18-30 salî de ye, me li Başurê Kurdistanê ji bo têgehiştina di navbera zarên Kurdî de modêlek ava kiriye.

Kilîle peyv: Zimanê Kurdî, Kurdiya Bakurî, Kurdiya Navendî, Kurdiya Bşûrî, Goranî ‘Zazakî, Hewramî’.

Abstract

Kurdish belongs to an Iranian language group within Indo-European language family. So, there are many similarities between Kurdish and other Iranian languages. Language families were founded because of such similarities between various languages. Kurdish is also a vague term due to the fact that Kurdish is unstandardized language, and it has four dialects. In this arena, there is a huge gap and it has had significant effects on Kurds in general. Kurdish language is very linked with Kurdish identity on the same time. So, the invaders of Kurdistan work hard to deform Kurdish, then destroy Kurdish identity. The assimilation process affected many areas of Kurdistan intensively, for example; the number of Kurdish speakers has decreased significantly in Northern

* Mamoste, Beşa Zimanê Kurdî, Zanîngeha Koya, Herêma Kurdistanê, Iraq, hewa.salam@koyauniversity.org.

Kurdistan, and Turkish language has taken its place. Thus, we as a linguist try to clarify the Kurdish language situation linguistically. In this study, we discuss Kurdish language family, Kurdish dialects, understanding between Kurdish dialects, and analyzing the current situation. This would be done by using various sources and publishing questionnaire in Koya University. With support of the responses of students who's between 18-30 years old, we have designed a model for understanding between Kurdish dialects in Southern Kurdistan.

Key words; Kurdish Language, Northern Kurdish, Central Kurdish, Southern Kurdish, Gorani 'Zazaki, Hawrami'

Destpêk

Herwekî nêzîkî û xizmayetî di navbera mirovan de heye, herwisa nêzîkî di navbera zimanan de jî heye (Chambers & Trudgill, 2004). Dema ku zimanewan lê nihêrt, wan dît, ku hinek ziman pir dişibin hev. Di heman demê de, gelek ziman hene, ku ne nêzî hev in. Bi vî avayî, vekolîn li ser peywendiyên zimanan dest pê kir û zimanên nêzîkî hev li malbatekî de hatin komkirin. Ew nêzîkî jî ne ji xwe re yan bi hokara wergirtina peyvyan e. Belkî hokar kok û bingeha wan e (Baldi & Cuzzolin, 2015: 820). Di serdema niha de gelek malbatên zimanan hene, zimanê Kurdî jî, ku mijara vekolîna me ye, dikeve nav malbata herî mezin a zimanan. Malbata zimanê Kurdî wekî malbata zimanên Hînd û Ewropî tê nasîn (Ethnologue, 2019). Ji bo zanîna rastî û dirustî polînkirina zimanê Kurdî di nav malbata zimanên Hînd û Ewropî û kom-zimanên Îranî de, me berhevkirineke destpêkî di navbera zimanên Kurdî, Farsî, Hîndî, Îngilîzî wekî zimanên eynî malbat û her du zimanên Erebi û Tirkî, wekî zimanên cîran kiriye.

Herwiha, zimanê Kurdî bi xwe jî li çend zaran¹ dabeş dibe, ku em li vir şîroveya peywendiyên navbera van zaran dikin. Bi giştî, çar zarên zimanê Kurdî hene (Heme Xurşîd, 2008; Khalid, 2015); Kurdiya Bakurî 'Kurmancî', Kurdiya Navendî 'Sorani', Kurdiya Başûrî û Zazakî-Goranî. Têgehiştina di navbera wan de cuda ye. Ew jî girêdayî çend hokarên zimanewanî û ne-zimanewanî ye. Lewma, polkirina ziman û zarên Kurdî cuda ne. Kêmbûna axaftina bi kurdî li gelek cihan de û bi taybet li bakurê Kurdistanê (Opengin, 2011: 136-160), têgehiştina navbera zarên Kurdî kêmtir jî kiriye. Ji bo ku ziman û zar û peywendiya navbera wan ronî bibe, me mînak ji zimanên din jî girtine.

Ji bo zanîna rola zarên Kurdî di Kurdistanê de û çawaniya dabeşbûna wan, me gelek çavkanî berhev kiriye û têgehiştina xwe ji bo wan zaran xistiye ber dest. Herwiha, devokên sereke hatine destnîşankirin. Di dawiyê vekolînê de, pîrsa elifbayên zimanê Kurdî hatiye gengeşekirin. Çimkî, ew jî gelek caran wekî berbesta sereke li ber devê nêzîkbûna zarên Kurdî derdikeve.

Di vê vekolînê de, ji bilî nasandina malbat, zar û elifbayên Kurdî, pirseke me ya sereke heye; Gelo têgehiştina navbera zarên Kurdî li herêma Kurdistanê çawa ye? Ev pîrs di tevahiya Kurdistanê de wek yek e, yan di herêmekê jî bo herêmeke din diguhere? Ji bo bersiva van pîrsan, çavkanî hatine komkirin û sed (100) formên rapirsî li Zanîngeha Koya hatine belavkirin.


¹ Di Kurdiya Bakurî de gelek caran peyva 'zarave' ji bo 'zar' tê bikaranîn. Lê ew peyv bi temamî xelet e. Zarave yan 'zarawe' bi Îngilîzî beramberî "expression" bi Erebi beramberî "المصطلح" tê. Şayenî gotinê ye, eynî tevlihevî di nav zimanewanên berê yê Kurdistanê Başur de jî hebû, lê piştî vekolînên etimolojî, êdî herkes van derbirinan rast bi kar tîne. Ev pîrsgirêk dibe ku ji nêzîkbûna van peyvyan derketibe.

Armanca me li belavkirina formên rapirsiyê, zanîna rêjeya têgehiştinê ye di navbera axêwerên zarên cuda li Herêma Kurdistanê - Zanîngeha Koya. Çimkî, ew encam dibe bingehê baş ji bo tevahiya Kurdistanê jî. Ji bo zanîna têgehiştinê di navbera zarên Kurdî de, me sê ast diyar kiriye; ‘zehf’ ji bo têgehiştina berfireh di navbera axêweran, ‘navîn’ ji bo têgehiştineke navîn û hebûna hinek pirsgirêk di dema axaftinê de, ‘kêm’ ji bo têgehiştineke lawaz û negehiştina mebesta axêwerî bi ronî.

Malbatên zimanan û koka zimanê Kurdî


Li gorî ‘ethnologue’ê, îro 7111 ziman li dinê hene (Ethnologue, 2019). Gelek ji wan zimanan jî hevbeşî di navbera wan de heye. Dema ku zimanewan li hevbeşiyên navbera zimanan nihêrtin û dîroka wan berhev kirin, têgehiştin ku bingeha hinek zimanan yek e. Ev yekbûn wekî “malbata zimanî” hat binavkirin. Ev malbatên zimanan têrmeke zimanewanî ye. Di nav xwe de jî, şax û popên van malbatên zimanî hene (Baldi & Cuzzolin, 2015: 820-821). Ji bo dîtina malbatên sereke, li hêlkariya jimare (1) binêre:

Hêlkariya 1: Malbatên sereke li gorî jimara axêwerên wan (Ethnologue, 2019).



Malbata zimanî ya Hînd û Ewropî mezintirîn malbata zimanî ye, ku Kurdî jî yek ji zimanên vê malbatê ye (Baldi & Cuzzolin, 2015: 823; Ethnologue, 2019). Piştî malbata zimanên Hînd û Ewropî, malbata Çînî-Tibitî tê, ku zimanê Mandarîn yek ji wan e. Mandarîn, ku zimanê fermî yê Çînê ye, mezintirîn zimanê cîhanê ye û zêdetirîn mirov vî zimanî wekî zimanê dayikê bi kar tînin (Ethnologue, 2019). Malbata Hînd û Ewropî di nav xwe de ji bo du şaxên sereke ‘kom-zimanên Rojhelatî û kom-zimanên Rojavayî’ dabeş dibe (Ismail, 1977). Herwiha, zimanên Anadolî, ku akinciyên resen ên axa Anadolîya Navîn û rojavayê wê bûne (Baldi & Cuzzolin, 2015: 824) û zimanên Tuxarî, di navenda Asya de, her beşekî vê malbatê bûn (Ethnologue, 2019). Ji bo zanyariyên zêdetir li hêlkariya duyem binêre:

Hêlkariya 2: Malbata zimanên Hînd û Ewropî (Bouckaert û hevalên wî., 2012) û zimanên sereke di nav Hînd û Ewropî de.



Her wek di vê hêlkariyê de xuya dibe, her du kom-zimanên Toxarî û Anadolî êdî nemane û wekî zimanên mirî tên hesabandin. Tenê hinek destnivîs ji van du zimanan mane.

Di nav malbata Hînd û Ewropî de, zimanê Kurdî dikeve nav kom-zimanên Îranî. Ji ber vê yekê ye ku Kurdî, Farsî, Peştû û Belûcî û zimanên Îraniyên din zêde dişibin hev. Gelek hevbeşî di navbera Kurdî û Hîndî de jî heye, lê ne bi qasî Kurdî û zimanên Îranî ye. Hevbeşiya Kurdî ligel zimanên din ên Hînd û Ewropî, ku ne li kom-zimanên Hînd û Îranî de ne kêmîr e.

Her çawa be, hevbeşî di nav zimanên eynî malbatê de zêdetir e bi berawird bi zimanên derveyê malbatê. Eger çî di serdema niha de gelek wekyekî di navbera Kurdî û zimanên wek Tirkî û Erebi çêbûye, lê ew wekyekî ne xwerû ne. Çimkî koka zimanên Kurdî, Tirkî û Erebi ne yek e (Ismail, 1977; Ethnologue, 2019).

Ji bo ku mebesta me ronîtir be, me deh (10) peyvên Kurdî di ferhengê de îna û wergerand ji bo çend zimanan, me dît ku peyv nêzî zimanê Farsî ne, Hîndî jî hinek dişibe Kurdî. Lê Îngilîzî durtir bûye û her yek li Tirkî û Erebi zehf dûr in. Ev jî wek mêtoda berawirdkariyê ji aliyê zimanewanan bi kar tê, bi mebesta destketina zanyariyên seretayî û ezmûnkirina dengsazî û peyvsaziya zimanên destnîşan kirî (Baldi & Cuzzolin, 2015: 821). Binêre xişteya yekem:

Xişteya 1: Peyvên Kurdî di çend zimanên din de.

Kurdiya Bakurî	Farsî	Hîndî	Îngilîzî	Tirkî	Erebî
av	آب ab	पानी panî	water	su	ماء ma'
du	دو du	दो do	two	iki	اثنان îsnan
dar	درخت dirext	पेड़ pêd	tree	ağaç	شجرة şecere
kirin	کردن kerden	करना karana	do	yapmak	فعل Fê'l
çiya	کوه kûh	पहाड़ pahad	mountain	dağ	جبل cebel
ez, min	من men	मैं mein	I	ben	أنا ena
bira	برادر berader	भाई bihayî	brother	erkek kardeş	شقيق şeqîq
na	نه ne	नहीं nehîn	no	Hayır	لا la
duh	دیروز dîruz	बिता कल bîta kal	yesterday	dün	الامس el-emis
derî	در der	द्वार divar	door	kapı	باب bab

Ew zimanên ku di eynî malbatê de ne, ne tenê ji aliyê peyvsazî, belku ji aliyên din jî nêzî hev in. Li xîştêya duyem, em cînavên sê zimanan (Kurdî, Farsî, Îngilîzî) didin ber hev:

Xîştêya 2: Danberheva cînavên zimanê Kurdî, Farsî û Îngilîzî

Kurdiya Bakurî	Farsî	Îngilîzî
ez/ min	men - من	I/ my
tu/ te	tu - تو	you/ your
ew/ wî, wê	āo - او	she, he, it/ he, his, its
em/ me	ma - ما	we/ our
hûn/ we	şuma - شما	you/ your
ew/ wan	anha - انها	they/ their

Bi giştî dikarin bêjin, destnîşankirina Kurdî û zimanê din jî di nav vê malbatê de, piştî vekolînên xurt û ekadêmîk bûye. Ew mînakên me dan, tenê ji bo ronîkirina xizmayetiya di navbera zimanan de bû. Herwiha, nêzîkiya dengsazî û peyvsaziya Kurdî û Farsî jî pêgira vê rastiyê ye.

1. Zarên zimanê Kurdî

Zar, bi Îngilîzî ‘dialect’ bi Erebi “اللهجة el-lehce”, di zimanê Kurdî de ji bo şêwazên cuda yê eynî zimanî tê bikaranîn. Ewên ku li zimanê Kurdî vekolîne, nerîna xwe seba vî zimanî li gorî têgehiştina xwe nîşan dane. Hinek ji wan gelek serketî bûne û karîne şîroveya peywendiyên navbera zarên Kurdî bikin, hinekan jî şîroveyên şaş kirine. Bo nimûne; jimareke zêde ya Rojhelatnasan, zarê Zazakî-Goranî dixin derveyê Kurdî (Hassanpour, 1993: 120; Khalid, 2013: 35-36).

Em dîsa şîroveya dabeşkirinan dubare nakin, lê derbarê pirsgirêka sereke ya cudakirina Goranî-Zazakî ji Kurdî, em mînakên zimanên din bi Kurdî berawird dikin. Gelek ji rojhelatnasan nerîna xwe bi têgehiştina navbera zarê Goranî-Zazakî digel zarên din ve girê didin. Em jî dipirsin gelo wan çavdêriya minakên zimanên din kiriye? Gelo bingeha cudahî di navbera ziman û zaran de tenê têgehiştin e yan tiştên din jî hene?

Di vî warî de mêtodên nû vê peywendiyê şîrove dikin. Li gorî mêtodan, ew xuya ye, ku peywendiya di navbera ziman û zaran de ne tenê têgehiştin e, belkî girêdayî gelek biwarên din e jî, mîna polîtîk, aborî, kultur û ...hwd. Mînaka zimanên Norweçî, Swêdî û Danmarkî li vir mînakeke pir bimana ye. Têgehiştin di navbera van zimanan de pir e, lê ew wekî zimanên cuda tînen hesabandin. Di eynî demê de, hinek zarê Germeî hene, ku wekî Zazakî û Kurdiya Bakurî têgehiştin di navbera wan de kêm yan tune ye, lê ew tev bi zimanê Almanî wekî yek ziman tînen hesabandin. Di demekî de, zimanê Almanî bi xwe gelek nêzî zimanên Skandînavî ye, lê zimanê Almanî û zimanên Skandînavî wekî zimanên cuda tînen hesabandin (Chambers & Trudgill, 2004: 3-4). Bi manayekî din, eger bingeha dabeşkirina zarên zimanên dinê bi vî rengî be, çima destûr û yasaya dabeşkirina zimanê Kurdî gerek cuda be?

Bi têgehiştina nû ya di dinê de, mirov dibe endamê komekê, eger ew mirov bi xwe bixwaze. Herwiha, eger mirov li gorî hemû aliyên jiyane endamê komekê be, lê bi xwe nexwaze, êdî nabe

endamê vê civakê (Anderson, 1999). Bi vî rengî, hem Zaza û hem Hewramî û Goran, di civaka Kurdî de roleke girîng dilîzin. Li gorî nerîna Kurdan, ew komeke sereke ya komelgeha Kurdî ne (Hassanpour, 1993: 120). Xebatên kesayetiyên mina Şêx Se'îdê Pîran, Selahattin Demirtaş, Azad Hewramî û Yılmaz Guney belgeyên gotina me ne, ku hertim rola Zaza û Hewramîyan di nav civaka Kurdî de xuya ye. Ew teorî û heqîqeta komelgeha Kurdî, tev zara Goranî-Zazakî dixin nav zimanê Kurdî û em jî li vir vê rastiyê qebûl dikin. Di dîrokê de jî dema ku dîroknvîsê mezin, Şerefhanê Bedlîsî behsa Kurdan dike, Zazayan di nav şaxa Goranan de dihesbîne û dinvîse; Çar grupa Kurdan hene, ew jî Kurmanc, Lor, Kelhûr û Goran (Şerefhanê Bedlîsî, 2014, r.62). Kurmancên serdema Şerefhan îro bûne du grûpên serbixwe. Ji aliyê zimannasî ve, ew bi zarên Kurdiya Bakurî û Kurdiya Navendî tînan nasîn, zara Kelhûran zêdetir wekî Kurdiya Başurî tê binavkirin, ku hinek jî Loran jî tevî vê grûpê bûne. Mixabin, Lorên din bi bandora mezheba Şi'îzîmê êdî xwe wekî Kurd nahesbînin. Zara Goranan jî wek Goranî yan Zazakî-Goranî tê nasîn.

Ji ber vê yekê, em dabeşkirina zimanewanê Kurd; Fu'ad Heme Xurşîd ji bo zarên Kurdî bi guhertineke kêr erê dikin. Heme Xurşîd zimanê Kurdî ji bo çar zarên sereke dabeş dike, Kurmanciya Bakurî, Kurmanciya Navendî, Kurmanciya Başurî, Goranî (2008). Ew jî ne gelek cuda ye ji parvekirina Cafer Sheyholislami ku zimanê Kurdî ji bo pênc zaran dabeş kiriye û Goranî û Zazakî wekî zarên serbixwe di nav zimanê Kurdî de hesabandiyê (2015: 31-36). Lê ez dîsa Goranî û Zazakî pêkve girê didim, çimkî ji aliyê dengsazî û peyvسازیyê ve, ew du şêwaz zêde dişibin hev.


Nerîna min derbarê zarên zimanê Kurdî de di vê hêlkariya jêr de xuya dibe. Herwiha min devokên sereke yê her zarakê diyar kiriye, lê dibe nerînên cuda derbareyê devokan de hebe. Wekî mînak, devokên Koçgirî û Kurmancên Dêrsîmê zêde dişibin hev. Hinek lêkoler, wan wekî du devokên cuda dihesbînin, hinek jî dikin yek devok. Minakên Koyî, Hewlêrî û Soranî jî her bi vî rengî ye. Di dîroka Kurdan de, kesê yekem, ku behsa devokên Kurdî dike, helbestvan û nivîskarê mezinê Kurdan Ehmedê Xanî ye. Ew dibêje:

Bohtî û Mihemmedî û Silivî

Hin le'î û hinek ji zêr û zîvî (Xanî, 2017, r.468).

Xanî di helbesta xwe de navê sê devokên Kurmancî wekî mînak ji bo hemî devokên Kurdî tîne û dibêje ku ew şêwazên Kurdî tev wekî gewher û zêr û zîv in.

Ji bo zaniyariyên zêdetir li ser zar û devokên Kurdî, li hêlkariya jimare (3) binêre:



Hêlkariya 3: Zar û devokên zimanê Kurdî

Mijara zaran di hemû zimanên dinê de heye. Ew mijar jî zêdetir girêdayî nasname û netewebûnê ye. Pirsgirêka Kurdî ji zimanên dinê cuda ye, çimkî Kurdistan welatekî bindest e. Ji ber vê yekê, Kurd nebûne xudanê zimanekî hevpar û sitandard. Li başûrê Kurdistanê, bi awayekî neresmî, zarê Kurdiya Navendî bûye zimanekî sitandard ji bo karûbarê dewlet, xwendin û mêdiyayê.


Ligel Kurdiya Navendî zarên din jî tîn bikaranîn û di van salên dawî de, xelkê parêzgeha Duhokê xwestin bi zarê Kurdiya Bakurî – devoka Behdînî perwerdehiya xwe bibînin. Bi awayekî fermî rêk bi wan hat dan (Khalid, 2013). Lê, biryara xwendin bi zarê xwe li Duhokê, pirsgirêkeke mezin ji bo Kurdiya Bakurî çêkiriye û ji bo miletî jî bûye zehmetî. Çimkî, li Behdînan devoka Badînî tê xwendin. Di nav Kurdiya Bakurî de jî, devokeke din bi sitandard bûye, ku gelek caran wekî “Kurdiya akadêmîk” tê binavkirin. Ew jî, li gelek deveran û diyasporayê, cihê xwe girtiye û bi tîpên Latînî tê nivîsandin û li rojavayê Kurdistanê bûye zimanê rêveberiyê jî. Eger rewşa herêma Behdînan bi vî awayî bimeşe, Kurdiya Bakurî di nav xwe de dibe du zarên cuda. Di dawiyê de, ew lihevnekirin pêgeha Kurdî di nav zimanan de û Kurdiya Bakurî li hemberî zarên din, bi taybet Kurdiya Navendî lawaztir dike.

Ji bo têgehiştin li fermîbûna zarê Kurdiya Navendî û bandora vî zarî li ser zarên din û destnîşankirina têgehiştina di nav zarên Kurdî de, me rapirsiyek di nav xwendekarên zanîngehê de belav kir. Di rapirsîya me de di nav xwendekarên Zanîngeha Koya de, beşdarbûn û zaniyariyên kesên beşdarbûyî bi vî rengî bû:

Xiştîya 3: zaniyariyên kesî

Jimara beşdaran	100 xwendekarên zanko, temen (18-30)			
Zayend	43% mêr		57% jin	
Zimanê dayikê	98% Kurdî		2% zimanên din	
Zarên zimanê Kurdî	Kurdiya Bakurî 8%	Kurdiya Navendî 78%	Kurdiya Başûrî 7%	Goranî (Hewramî) 7%


Derbarê têgehiştina zarên Kurdî, me çend pirs li xwendekaran kiribû. Ji bo hemî zarên Kurdî me elifbaya Erebî, ku elifbaya fermî ya Herêma Kurdistanê ye, bi kar anî. Ew jî bi mebesta derneketina pirsgirêkên elifbayê bû. Me sê rêje ji bo têgehiştina di navbera zarên Kurdî de diyar kir. Encam nîşan dide ku tevahiya xwendekarên Kurd ên di zanîngeha Koya de, Kurdiya Navendî bi asteke pêşketî dizanin. Axêwerên zarê Kurdiya Navendî jî, têgehiştineke navîn ji bo zarên Kurdiya Bakurî û Kurdiya Başûrî heye. Lê asta têgehiştinê di navbera Kurdiya Bakurî û Kurdiya Başûrî, Kurdiya Navendî ji bo Goranî, Kurdiya Bakurî û Kurdiya Başûrî li gel Goranî, kêm e. Bi palpiştîya vî rapirsîyê, min modêlek ava kir ji bo diyarkirina asta têgehiştinê di navbera zarên Kurdî de. Ji bo zaniyariya zêdetir li hêlkariya (4) binêre:



Hêlkariya 4: têgehiştin di navbera axêwerên zarên Kurdi di nav xwendekarên zanîngeha Koya de

Gelek hokar hene ji bo derketina vê encamê, mîna bandora polîtîka, mêdya, perwerde, abûrî û gelek hokarên din, ku axêwerên zarên din ji bo Kurdiya Navendî dikşînin. Lê ew palner ji bo axêwerên Kurdiya Navendî kêmtir e, seba hînê zarê Goranî bibin, wekî mînak. Herwiha, dibe ku ev encam li bajarekî mîna Helebce yan Sineyê biguhere, çimkî li wir civaka Hewramî û Kurdiya Navendî di nav hevdu de ne. Lê ew Hewramiyên ku hatine Koyeyê, naçar mane zarê fermî hîn bibin. Di demekî de xwendekarên din ne naçarî zarê ewên mêvan hîn bibin. Ew tişt ji bo peywendîya navbera zarên Kurdiya Bakurî û Kurdiya Başûrî de jî rast e. Ew du zar peywendiyên bihêz li gel Kurdiya Navendî heye, lê ew peywendî di navbera wan de kêmtir e. Hokarên erdnîgarî û deselat jî di vî warî de roleke girîng dilîze. Di navbera Duhok û Xaneqînê de zêdetir li 400 kîlometir heye (Nexşeya Googlê, 2019). Lê her du Kurdiya Bakurî û Kurdiya Başûrî cîranên Kurdiya Navendî ne. Bi vî rengî herêma hevbeşa berdewamiya zarî di navbera wan de çêbûye, ku têgehiştinê zêde dike (Khalid, 2015: 36). Lê ew herêm di navbera Kurdiya Bakurî û Kurdiya Başûrî, Kurdiya Bakurî û Goranî 'Hewramî', Goranî 'Hewramî' û Kurdiya Başûrî di herêma Kurdistanê de tune ye. Bi mifadîtin li nexşe û şîroveyan berê (Ethnologue, 2019; Haig & Öpengin, 2015; Hassanpour, 1993; Khalid, 2015; Khalid, 2013; Sheyholislami,

2015; Heme Xurşîd, 2008) û dîtina kêmasiyan, min nexşeyek ji bo Kurdî nexîşand, ku zarên zimanê Kurdî di nav axa Kurdistanê de nîşan dide. Kurdî di derveyê Kurdistanê jî, li Xorasanê, navenda Anatoliyayê, Urdunê, hinek welatên Yekêtiya Soviyetê berê, Îsraîlê û diasporayê tê bikaranîn. Ji bo zaniyariyên zêdetir binêre nexşeya dabeşkirina zarên Kurdî:



Nexşe: Dabeşbuna zarên Kurdî di nav axa Kurdistanê de.

Di encamên me de, têgehiştina di navbera xwendekarên Kurd de, bi berawird bi vekolînên berê, hinekî zêde bûye. Mînak li gorî wan, têgehiştina di navbera axêwerên Kurdiya Bakurî û Kurdiya Navendî de kême (Haig & Öpengin, 2015: 247), lê li cem me navîn e. Hokara van nerînên cuda gelek in. Beşdarên me xwendekarên zankoyê ne û hevalên wan li bajarên cor bi cor hene, ji zarokiya xwe heta zanîngehê bi kurdî perwerdehî dîtine. Herwiha, mêdyaya û torên civakî îro li başûrê Kurdistanê roleke erênî dilîzin. Di demekî de, rola mêdyaya Kurdî li parçeyên din ên Kurdistanê kêmtir e û mêdyaya nekurdî cihê Kurdî girtiye, minak di nav Kurdên Tirkiyayê de (Opengin, 2011: 146). Ew encam jî, guhertineke girîng e û gerek kar li ser wê bihête kirin ji bo zêdekirina têkelî di navbera ciwanên Kurd de.

1. Elifbayên zimanê Kurdî

Di dema em behsa ziman û perwerdeyê dikin, berî her tiştek çavê me diçe ser elifbaya ziman. Çimkî mirov bi rêka elifbayê dikarin binivîsin, perwerdeyê bibînin yan zimanên nû hîn bibin. Elifba jixwe ne ziman e, lê çawaniya xêzkirina ziman e (Saussure, 1998). Li gorî mêtoda Saussure, em dikarin wiha şîroveya vî halê heyî bikin; Kurdên Başûr û Rojhelat hêsantir hînî Farsî û Erebi dibin, lê hînbûna eynî zimanan ji bo Kurdên Bakur zehmet e. Çimkî şewaza xêzkirina wan cuda ye.

Heta niha elifbayeke hevbeş di nav Kurdan de ji bo nivîsandina Kurdî tune ye. Ew jî bandoreke mezin a nerênî li ser zimanê Kurdî kiriye û bûye pirsgirêkeke aloz, ku çareserkirina wê jî aloz e. Cudahiya elifba û cudahiya astên din ên zimanî, bi taybet di navbera Kurdiya Bakurî û Kurdiya Navendî de, bûne sedema lawazbûna têgehiştinê (Haig & Öpengin, 2015: 247). Îro Kurd ji bo nivîsandina zimanê xwe sê elifbayên cuda bi kar tînin, ku du ji wan sereke ne (Sheyholislami, 2015: 36):

Yekem, elifbaya Erebiya çêkirî, ku Kurdên Başûr û Rojhelat bi fireyî bi kar tînin. Ew elifba zêdetir ji bo nivîsandina Kurdiya Navendî, Kurdiya Başurî û Hewramî tê bikaranîn. Herwiha, di parêzgeha Dihokê jî, ku bi Kurdiya Bakur - Behdînî dinivîsin, dîsa elifbaya Erebiya çêkirî tê bikaranîn. Ew elifba bi berawird bi elifbayên din zêde pêş ketiye û bi hezaran pirtûk bi vê elifbayê hatine çapkirin. Herwiha, di nav Kurdan de dîroka wê heye û nivîskarên edebiyata Kurdiya klasîk, tev elifbayeke nêzî vê elifbayê bi kar anîne, minak Melayê Cizîrî, Nalî, Mestûrey Erdelanî û ...hwd. Sheyholislami koka wê digihîne sedsala 15an, lê di sedsala borî de li gorî fonetîka kurdî hatiye sererastkirin (2015: 36).

Duyem, tîpên Latînî, ku ji aliyê Kurdên bakurê Kurdistanê, Kurdên rojavayê Kurdistanê tê bikaranîn. Li gel derketina komarê Tirkiya û şikist anîna Kurdan piştî Şerê Cîhanê yê Yekem, êdî zimanê Kurdî rûberûy qedexeyê hat, bi taybet zarên Kurdiya Bakurî û Zazakî. Deselatdarên Tirkî bi her rengî li hemberî elifbaya Osmanî di zimanê xwe de û zimanê Kurdî jî der ketin. Êdî Kurd naçar man xwe li gel rewşa nû ya welatê dagîrker biguncênin. Celadet Alî Bedirxan di sala 1932yan de, li kovara *Hawarê* bingeha tîpên Latînî ji bo Kurdî pejirand (Cewerî, 1998). Tîpên Latînî ji bo Kurdên Bakur pir girîng e. Çimkî ev elifba pir nêzî elifbaya Tirkî ye, wê jî aliyê xwendekarên Kurd kir, heta bi rêka elifbaya fermî ya dewletê xizmeta zimanê xwe bikin. Herçiqas ev şewaza nivîsê nêzî Tirkî ye, lê Tirk hertim li hemberî Kurdiya Latînî derketine û ji bo çend salan tîpên 'Q, X, W' hatin qedexekirin. Çimkî ew tîp di Tirkî de tune ne (Aslan, 2009: 14).

Sêyem, elifbaya Kirîlî ye (Sheyholislami, 2015). Elifbaya Kirîlî ku ji aliyê zimanê Rusî ve bi kar tê, ji aliyê Kurdên Yekêtiya Soviyetê jî bi fireyî ji bo nivîsandina Kurdî dihat bikaranîn. Lê belê, di serdema niha de, Kurdên Rusya jî ku zêdetir bi Kurdiya Bakurî diaxivin, tîpên Latînî bi kar tînin.

Di vî warî de, bi giştî Kurdên Başûr û Rojhelat zêdetir amade ne ji bo qebûlkirina Latînî û di mêdya, jiyana û nivîsê de bi fireyî Latînî bi kar tînin û xwe hîn dikin. Di nav rewşenbîrên Başûr de, hin kes hene, ku palpiştiya guhertina elifbaya Erebi ya çêkirî di Kurdiya Navendî de ji bo Latînî dikin (Sheyholislami, 2015: 36-37). Lê ew amadeyî di nav Kurdên Bakur de tune ye. Jimareke kêr ji Kurdên Bakur elifbaya Kurdiya Navendî dizanin. Dibe hokara vê jî xweseriya

Başûr be. Çimkî ew zêdetir dikarin derbarê zimanê Kurdî biryar bidin, lê derfeta Bakur gelek kêr yan tune ye. Tiştî balkêş li vir, biryara Kurdên Rojava ye ji bo bi kar anîna tîpên Latînî. Niha, tenê ew, elifbaya dewleta navendî ya xwe (Sûriya) bi kar naynin.

Encam

Piştî şîrovekirina çavkaniyên berê û belavkirina rapirsî di nav xwendekarên zanîngeha Koya, gelek encam derketin. Li gorî encamên vê lêkolînê, zimanê Kurdî yek ji zimanên Hînd û Ewropî ye û nêzîkatiyeke berfireh ligel zimanên din ên vê malbatê de heye, bi taybet ligel kom-zimanên Îranî. Zimanê Kurdî li çar zarên sereke pêk tê; Kurdiya Bakurî, Kurdiya Navendî, Kurdiya Başurî û Zazakî-Goranî. Têgehiştina di navbera zarên Kurdî de li cihekî ji bo cihekî din diguhere. Lê ew tev wekî zarên zimanê Kurdî dimînin. Ew jî ne tenê girêdayî encamên zimanewanî ye, belkî civaka Kurdî wekî Kurd difikire û heta îro ew raman didome. Minakên wisa di dinê de hene û ne tenê taybet e bi zimanê Kurdî.

Ji bo parastina zimanê Kurdî, gerek Kurd li hemî zarên xwe xwedî derbikevin. Lê pêwîstiya Kurdan bi zerekî hevpar jî heye, wekî hemî zimanên dinê. Ji bo vê yekê jî planeke zimanî ya demdirêj lazim e. Di vî warî de, gerek her du deselatên kurdî yên Herêma Kurdistanê û Kurdistanê Rojava roleke dîrokî bilîzin. Ew dikarin bandora xwe li ser her du parçeyên bindest, bakur û rojhelata Kurdistanê çêbikin. Çareseriya destpêkî jî, gerek çareserkirina elifbaya Kurdî be. Herwiha, gerek di plana zimanê Kurdî de, pişt bi herêmên hevbeş di navbera zarên Kurdî de bê bestin. Teqez ev li ser wekyekîyan bînê kirin, ne ku cudahî bînê zêdekirin.

Zanîngeha Koya mînakeke baş e di vî warî de. Ew vekolîn bi me dide hînkirin, ku eger têkelî di navbera ciwanên Kurdan de hebe, pîrsgirêka têgehiştinê namîne. Êdî herkes dikare bi zarê xwe bi axive û hevdu jî tê bigehin. Di encamê de, ziman jî ber bi standardbûneke qebûlkerî diçe.

Di mijara zarên zimanê Kurdî de, tiştêkî zanistî û girîng heye, ku gerek her kes bizane. Xwendin û perwerde bi zimanê dayikê mafê her kesekî ye di dinê de. Kurd jî ji bo vê yekê dixebitin. Lê xwendin bi zar û devokan li çî derî dinê de ne maf e. Mînaka wisa li dinê de tune ye, ku her kes zimanê gundê xwe, bajar û bajarokê xwe perwerdeyê bibîne.

Çavkanî

Anderson, B. (1999). *Imagined Communities: Reflections on the Origin and Spread of Nationalism*. (R. edition, Ed.) London ; New York : Verso: British Library cataloguing in publication data.

Aslan, S. (2009). *Incoherent State: The Controversy over Kurdish Naming in Turkey*. *European Journal of Turkish Studies*, 10, 1-20.

Baldi, P., & Cuzzolin, P. (2015). *Indo-European Languages*. *International Encyclopedia of the Social & Behavioral Sciences*, 820-827.

Cewerî, F. (1998). *Kovara Hawar, 1, Hejmar 1-23 (1932-1933)*. Stockholm: Nûdem.

Chambers, J. K., & Trudgill, P. (2004). *Dialectology*. (2. Edition, Ed.) Cambridge: Cambridge University Press.

Ethnologue. (2019, August 1). *Ethnologue*. Retrieved from <https://www.ethnologue.com/>

Nexşeya Googlê (2019). *Nexşeya Googlê*. Retrieved from <https://www.google.com/maps>

Haig, G., & Öpengin, E. (2015). *Gender in Kurdish Structural and socio-cultural dimensions*. In M. Hellinger, & H. Motschenbacher, *Gender Across Languages* (pp. 247-276). John Benjamins.

Hassanpour, A. (1993). *Kurdish Studies: Orientalist, Positivist, and Critical Approaches: Review Essay Kurdish Ethnonationalism by Nader Entessar*. *The Middle east Journal*, 47(1), 119-122.

Khalid, H. S. (2013). *The language and politics of Iraqi Kurdistan*. Exeter: Master thesis.

Khalid, H. S. (2015). *Kurdish dialect continuum, as a standardization solution*. *International Journal of Kurdish Studies*, 1(1), 27-39.

Bedlîsî, Ş. (2014). *Şerefname -Dîroka Kurdistanê. wergera Kurmancî: Ziya Avcı*. Stembul: Azad.

Öpengin, E. (2011). *Rewşa Kurdiya sosyolenguîstîk li Tirkiyeyê*. Stembul: Avesta.

Saussure, F. d. (1998). *Course in General Linguistics*. (R. Harris, Trans.) Open Court.

Sheyholislami, J. (2015). *Language varieties of the Kurds. The Kurds: History–Religion–Language–Politics*, 30-52.

Xanî, E. (2017). *Mem û Zîn. Komkirin û amadekirin: Şamîl Esgerov; Mehmet Kaplan; Huseyn Şemrexî*. Stembul: Nûbihar.

اسماعيل، ز. ب. (١٩٧٧) تاريخ اللغة الكردية. بغداد: مطبعة الحوادث.

حههه-خورشيد، ف. (٢٠٠٨) زمانى كوردى و دىالېكتنهكانى شىكر دنهوهيهكى جوگرافيايى. سلېمانى: دهزگاي چاپ و پهخشى سهردهم.



XEBATÊN AKADEMÎK YÊN KURDOLOJİYÊ LI TURKIYÊYÊ (2009-2019)¹

ACADEMIC KURDISH STUDIES IN TURKEY (2009-2019)

Resul Geyik, Esat Şanlı, Roger Acun, Ruken Çalıřtıran Karabat, Ahmet Kan, Veysel Yıldızhan ²

Kurte

Herdem di her qada akademîk de, gellek xebatên akademîk wekî tez, gotar û kovar û hwd tên amadekirin û ev hewldana lêkolînê bi şewirmendîya mamosteyekî akademîk di bin sîvana zanîngehekê de dibe sedema afirandina agahiyan. Di vî deh salên dawî de gelek xebatên cûr bi cûr wekî xebatên kurdolojîyê pêk hatin, armanca me ew e ku em bikaribin ev xebatên navborî binirxînin ku mirov bikaribe tevahîya wêneya xebatên akademîk yê kurdolojîyê li tirkîyeyê bibîne. Ji ber vê, me hewl da tesnîf, analîz û şîroveyên xwe bi awayekî akademîk li ser hejmara tez û gotaran bikin û bi saya (xêra) nirxandinek em siberoja xwe di nav konteksekê de ji paşeroja xwe dûr nexin û tiştên zêde bibînin û yê kêr jî tespît bikin.

Peyvên sereke: Tez, Gotar, Kurdolojî, Nirxandin

Abstract

In each academic field, as is known numerous academic studies such as thesis, articles and journals are the steps to elevate the academic level and thesis are prepared under the supervision of a thesis supervisor under the umbrella of a university in related unit of faculty or enstitute in order to produce knowledge. In the previous 10 years, a great variety of studies have been achieved in Kurdish Studies field, and our objective is to examine and evaluate the works and studies mentioned in Turkey. We, therefore, tried to classify, analyze and evaluate the thesis and articles academically so that we have grasp and acquire the future within the context of past and see what have been done so far and what needs to be focussed on.

Key words: Thesis, Article Kurdish Studies, Evaluation

¹ Ev xebat wekî xebata lêkolînê ji bo Dersa Zimannasîyê (Hayreddin Kızıl) hatiye kirin.

² Zanîngeha Dicleyê; Resul Geyik, resulteacher@gmail.com; Esat Şanlı, esatsanli@hotmail.com ; Roger Acun, rogeracun@gmail.com ; Ruken Çalıřtıran Karabat, rukencalistiran@gmail.com , Ahmet Kan, ahmedkani21@gmail.com; Veysel Yıldızhan,

Özet

Bilindiği gibi akademik her alanda bilgi üretimini artırmak için bir üniversitenin ilgili birimi fakülte veya enstitüde bir danışman kontrolünde tezler hazırlanır ve kişiler, makale ve dergiler aracılığıyla çalışmalarını takdim ederler. Son on yılda Kürdoloji'de pek çok çalışma gerçekleştirilmiştir. Amacımız bahsi geçen tez ve makaleleri inceleyip değerlendirmektir. Bundan dolayı bu tez ve makaleleri geçmiş ve gelecek çerçevesinde değerlendirip şu ana kadar yapılmış çalışmaları ve ihtiyaç duyulanları vurgulayarak sunmaya çalıştık.

Anahtar Kelimeler: Tez, makale Kurdoloji, değerlendirme

Destpêk

Wekî tê zanîn xebatên kurdolojîyê li tirkîyeyê demek kin e ku dest pê kirine, ev xebat jî wekî tê texmînkirin pîranî li ser pisporîya mamosteyan û li ser dilxwazbûna xwendekaran ku dixwazin çî bixebitin şîn dibe. Ji ber ku ev heyam heyamek nû ye, ev derdora 10 salan e, hêjî mirov di nav kelecânîyê de mezin de ne. Ji bona xebatên akademîk 10 sal ne demek dirêj e hetta pîr kin û kurt e. Ji bona ku bi nêrînek akademîk ev deh sal bîr nîrxandin, analîzek baş bê kirin ku di destê me de çî heye û çî tune ye derkeve hole mebesta me ji vê xebatê nîrxandina xebatên akademîk ên li Tirkîyeyê ye. Gotar jî destpêk, du beşan û ji encamekê pêk tê. Beşa yekem de lîsteya tezan hene û di beşa yekem ya tezan de, armanca me bî awayekî zelal pêşkêşkirina tezan li gorî sal, mijar, zanîngeh û şewirmenda ye. Di beşa duduyan de lîsteya gotarên akademîk û pirtûkên zanîngehan hene. Di vê beşê de, armanca ma ew e ku mijarên ne wekî gotar lê wekî gotaran hatine xibitîn nîşan bidin ku kesên ku têkevin nav hewldana lêkolîneke ku bikaribin hemû tiştên ku bi awayekî akademîk hatine kirin bê dîtin. Gotar bi encamê xelas dibe. Di encamê de jî, çavdêrî, nîrxandin û pêşnîyazên me li gorî îstatîstîkên li gorî hejmar û mijarên têz û gotar hatine kirin.

1. LÎSTEYA TEZÊN LÎSANS A BILIND (2012-2019)

Di vê beşê de em ê li ser tezen Kurdî rawestînin. Em ê sal bi sal lîsteya tezan nîşanî xwendekaran bidin. Bi vî awayî kengê hejmarê tezan zêde bûye dê baştir bê dîtin. Yakup Aykaç jî xebatek bi vî şêklî pêk anîye lê xebata wî li ser analîza 5 salan e (2011-2016). Cudahîya xebata me, ev deh salên dawî ne û analîza gotaran jî heye.

Li Gorî Salan Hejmarê Tezen Kurdolojîyê (2012-2019)

Zanîngeh	2012	2013	2014	2015	2016	2017	2018	2019	Komînek
Dicle					3	4			7
Bîngol	-	-	7	14	3	13	9	1	47
Mûş Alparslan	-	-	-	4	3	8	3	1	19
Mardin Artuklu	2	11	10	9	16	13	17	3	72
Yüzüncü Yıl				1	15	36	4		56

Li Gorî Şaxên Zanistan Tezen Kurdolojîyê (2012-2019)

	Dicle	Bîngol	Mûş Alparslan	Mardin Artuklu	Yüzüncü Yıl	Komînek
Dîrok/ Jînenîgarî / Civaknasî		1	3	4		7
Folklor	3	12	5	5	4	29
Edebiyata Klasik	1	14	4	18	4	41
Edebiyata Zarokan		1	0			1
Edebiyata Modern		6	3	28	36	73
Perwerdehî	1	0	0	3		4
Wergernasî		0	0	1		1
Zimannasî	2	12	3	19	12	48
Çapamenî		1	1	4	2	8

Li Gorî Ziman û Zaravayan Tezên Kurdolojiyê (2012-2019)

	Dicle	Bîngol	Mûş Alparslan	Mardin Artuklu	Yüzüncü Yıl	Komînek
Kurdî/Kurmancî	1	17	15		11	44
Kurdî/Kirmanckî		11		13		24
Kurdî/Soranî		5		5		10
Tirkî	6	14	4			24
Sormanci					45	45

2012

Çiftçi, Tekin, *Di Kilamên Evînî yên Dengbêjan de Temaya Jinê*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2012, r. 187.

Ergün, Zülküf, *Di Peydabûna Edebiyata Kurdi ya li Cizîra Botan de Karîgeriya Bajarvaniyê*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2012, r. 197.

Pertev, Ramazan, *Mîrsadu'l-Etfal (Şahrahê Kûdekan) Ferhenga Menzûm a Kurdî-Farîsî (Vekolîn-Tekst)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2012, r. 165.

2013

Adak, Reşat, *Di Serdema Meşrûtiyetê de Zanyarekî Kurd: Seidê Kurdî û Hizr û Xîtabên Wî Derheqê Elişmendiya Gelê Kurd de*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 156.

Adsay, Fahriye, *Romana Kurdî (Kurmancî) ya Dîrokî: Bîra Civakî û Nasname*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 131.

Attı, Hikmettin, *Lêkolîneke Folklorî li ser Destana Mem û Zîn*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 313.

Beğik, Mahmut, *Dengbêj Resoyê Gopala (Jiyau û Berhem)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 125.

Beyter, Önder, *Dîvana Mela Ehmedê Heyderî (Metn û Lêkolîn)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 242.

Bilge, Evin, *Ji Hêla Naverokê ve Dahûrîna Çiroken Mela Mehmudê Bazîdî*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 120.

Bingöl, İbrahim, *Kirmanckî (Zazakî) de Pêveronayîşê Fekê Çewlîgî û Gimgimî*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 110.

Bülbül, Mikail, *Di Helbestên Cegerxwîu de Rengvedanên Têkiliyên Îqtîdarî*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 111.

Çeçen, Ramazan, *Di Edebiyata Kurdî de Folklor û Roman li dor Texeyyulên Berê Rêçên Îroyîn*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 138.

Gören, Ebubekir, *Di Romanên Erebe Şemo de Folklorê Kurdî*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 184.

Güntaş Aldatmaz, Nadire, *Folklorê Kirmancan (Kirdan/Dimiliyan) Ser o Cîgêrayîşê*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 248.

İlhan, Ziver, *Mewlûda Mela Huseynê Bateyî (Metn û Lêkolîn)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 178.

Kan, Ahmet, *Di Zimannasiyê de Morfolojî û Wekî Mînak Morfolojiya Kurmancî*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 173.

Samur, Aziz, *Destana Zembûlfiroş û Gulxatûnê*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 157.

Yılmaz, Serdar, *Dîwana Şêx Şemsedîne Exlatî Metin û Lêkolîn*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 149.

2014

Ahmed, M. Araz, *Berawirdiyek di Navbera Morfîmên Rêzîmaniyên Karî di Kurmanciya Bakûr a Stander û Devoka Duhokê da*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 141.

Arslan, Mesut, *Di Dewra Osmaniyan de Weşangeriya Kitebên Kurdî (1844-1923)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 191.

Aslanoğulları, Mehmet, *Lerch'in Zazakî Derlemelerinin Çevrimyazımı ve Türlerine Göre Sözcüklerin Tahlili*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2014, r. 164.

Aşna, Burçin, *Bingöl'de Zazaca Atasözlerinin Tahlili*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2014, r. 135.

Başaran, Cahit, *Kürt Dilinde Sözlükler*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2014, r. 85.

Bor, Abdulkerim, *Bingöl Yöresi Zazaca Halk Türküleri*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2014, r. 170.

Çeper, Fatime Janez Sar, *Lêkolînek li ser Helbesta Qedri Can*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 127.

Ekici, Abdullah, *Zeynelabidînê Amidî: Jiyan Berhem û Xebatên Wî yên Destnivîsî*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 235.

Erdoğan, Hatip, *Meseleyê Dormalê Darahênî (Wasif-Metnê)*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2014, r. 116.

Gürür, Zeki, *Dengbêjî di Peywenda Patronajê de*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 133.

Hami, Bangeen İbrahim, *Rexneya Civakî di Romanên Hesenê Metê da*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 130.

Hussein, Hilbeen Mohammad, *Pêkhatayên Diramayê di Hozanên Bedîrxan Sindî da*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 147.

Filiz, Mehmet Şirin, *Xebatek li ser Destana Dewrêşê Evdî*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 228.

Karaaslan, Mehmet Salih, *'Hedersmord' li Swêdê Kuştina Namûsî' li Kurdistanê*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 119.

Kırkan, Ahmet, *Mewlîdê Usman Esad Efendîyo Babijî 'Bîyîşa Pêxemberî' (Metn û Wekenitiş)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 155.

Koyuncu, Hüseyin, *Di Hin Dîwanen Kurmancî de Bandora Tesewûfê*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2014, r. 115.

Mohammed Ghaffar, Nergiz, *Îstatîka Cihî di Romanên Sebrî Silêvanî da*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 151.

Öztürk, İrfan, *Hîmên Helbesta Kovara Tîrêjê*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 95.

Öztürk, Serdar, *Di Tradîsyona Dengbêjiya Kurdî de Şakiro (Jiyan û Berhem)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 144.

Polat, Edip, *Di Çend Pexşanên Kurmancî de Evînen Efsanevî*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 161.

Söylemez, Semra, *Melekan, Gaz ve Muradan Köyleri Zazacasının Ses Değişimi Yönünden Karşılaştırılması*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2014, r. 113.

Subaşı, Kenan, *Ji bo Zarokan di Fêrkirina Kurdî de Rola Mamikan*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 243.

Veroj, Sait, *Veracêkerdana Gramerê Zazakî û Kirmancî: Dîyalekt Alfabe û Fonetik Morfolojî*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 174.

Yeşilkaya, Şahap, *Edebîyatê Kirdkî (Zazakî) de Mewlid û Mehemed 'Elî Hunî*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2014, r. 165.

Yeşilmen, Davut, *Temaya Sirgûnê di Çar Romanên Kurdî (Kurmancî) de*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 163.

Yousif, Hajar Kamal, *Wata di Dîyaloga Karikatêrê Kurdî da (Vekolîneka Sîmantîkî û Pragmatîkiye)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 115.

2015

Abo, Reber Hussein, *Çîroka Gelek Kurt di Edebê Kurdî da li Başûrê Kurdistanê (1991-2013)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 159.

Açar, Zafer, *Devoka Devera Filistanê*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2015, r. 129.

Altıncılıç, Ümran, *Xwendîneke Baxtînyen di Sê Romanên Kurdî de*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 108.

Anuk, Nevzat, *Behsê Tirkkerdişê Kurdan de Merkezêk: Enstituyê Cigêrayîşê Kulturê Tirk*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 122.

Apuhan, Danyal, *Vistunikunî Zazakîye Çewlîg di Bawerî Bebinî de*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2015, r. 117.

Aydoğdu, Yusuf, *Modern Zaza Hikâyeciliği (Tespit-Tahlil)*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2015, r. 65.

Aygün, Muhsin, *Bingöl Yöresinde Kullanılan Zazaca Hayvancılık Kavramları*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2015, r. 123.

Aykaç, Yakup, *Dîwana Hezîn (Metn, Lêkolîn û Ferheng)*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2015, r. 604.

Bozkoyun, Mehmet, *Çend Çîrokan Herêma Şêxan (Metn û Aualîz)*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2015, r. 194.

Çalıştıran Karabat, Ruken, *Lêkolîneke Giştî li ser Çîrokên Kurdî yên Gelêrî (Bi Nimûneyên di Weşanên Ekola Şamê de) (Vekolîn-Senifandin)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 305.

Çelik, Murat, *'Adat û Rusûmatname'ê Tewayîfê Ekradiye ya Mela Mehmûdê Bazîdî*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 230.

Çiftçi, Metin, *Eqîdenameyo Zazakî ye Mela Mehemedê Hezanîyî (Metno Transkribekerde, Wekenitiş û Açrnayîş)*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2015, r. 75.

Demir, Perihan, *Zazakî de Derheqê Awanî û Antişî yê Karî Ser Yew Cîgêrayîş*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2015, r. 155.

Dolgun, Rıdvan, *Mintiqaya Darahênî-Zikte de Termê Hacetan û Manayanê Hacetanê ke Cuya Rojane de Şuxulyenê*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2015, r. 128.

Gezer, Semih, *Dîwana Mela Yasîn Yusrî (Metin û Lêkolîn)*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2015, r. 262.

Gözeten, İbrahim, *Mele Xelîlê Sêrtî û Berhema Wî ya Nehcul-Enam (Metn û Lêkolîn)*, Zanîngeha Muş Alparslan, Enstîtuya Zanistên Civakî, Mûş, 2015, r. 191.

Hussein, Shreen Jaafar, *Wênê Jinê di Hozana Hevçerxa Kurdî da*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 90.

Hussain, Hunar M., *Rollî Rageyandin le Nezikkirdnewey Diyalêkte Kurdyekan, Torî Mîdyayî Rudawû be Nimûne*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 165.

Ismael, Abid Camel, *Rengvedana Geşbîniyê di Helbesta Nû ya Kurdî li Devera Behdînan da*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 137.

Işık, Burhan, *Berhema Mehmed Uzun a bi Navê Hawara Dîcleyê de Jiyana Kurdan a Civakî*, Zanîngeha Muş Alparslan, Enstîtuya Zanistên Civakî, Mûş, 2015, r. 143.

Jahany, Parviz, *Leyla û Mecnûna Sewadî (Metin-Lêkolîn-Şîrove)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 399.

Kaplan, Yaşar, *Destana Kela Dimdim û Xatê Lepzêrîn (Lêkolîneke Edebî û Dîrokî)*, Zanîngeha Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, 2015, r. 184.

Kılıç, Özlem, *Gramerê Zazakî de Derheqê Negatîfîye Yew Cîgêrayîş*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2015, r. 130.

Kurt, Şehmuz, *Nirxandina Pirtûka Hînkirina Kurdî: Hînger -Li gorî Nêrînên Xwendekar û Mamosteyan-*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 187.

Orkin, Şeyhmus, *Di Berhemên Feqîyê Teyran de Hemanên Tesewufî*, Zanîngeha Muş Alparslan, Enstîtuya Zanistên Civakî, Mûş, 2015, r. 176.

Pesen, Abdurrahim, *Helbesta Arjen Arî (Naverok, Şêwe, Binyad)*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2015, r. 112.

Saleh, Warin Delshad, *Bekir Bege Erizî (Jiyan û Berhem)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 262.

Tarduş, İbrahim, *Bikaranîna Çîroken Kurdî di Perwerdeya Zarokan de*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 158.

Taş, Çetin, *Dengsaziya Devoka Çaldiranê, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 115.*

Ulugana, Sedat, *Mîrekiya Bitlîsê di Ewra Evdal Xan de (1618-1664), Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 83.*

Varol, Murat, *Abdulaziz Beki'nin Divanı (Metin-İnceleme), Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2015.*

Yergin, Mehmet, *Mewlîdê Mela Ehmedê Xasî "Mewlidu'n-Nebiyu'l- Qureşiyî" (Metn-Wekenitiş), Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 218.*

Yıldız, Ayhan, *Qewlê Hespê Reş, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 181.*

Yılmaz, Abdurrahman, *Zazaca-Türkçe Sözlük (Genç-Bingöl Yöresi), Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2015, r. 190.*

Yılmaz, Ferhat, *Berawirdkirinek li ser Şivanê Kurmanca û Sêbareya Maksîm Gorkî, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 125.*

ÖZTÜRK, Mustafa, Vekolînek Derbarê Gotinên Pêşîyan ên Kurmancî de, Kovara Mukaddimeyê cild: 6, jimar: 2(12), Payîz 2015 (r. 319-337) KURMANCÎ

ÖZTÜRK, Mustafa, Zûgotinok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de, Kovara EZZUBê cild: 2, jimar: 3, 2016 (r. 23-43) KURMANCÎ

ÖZTÜRK, Mustafa, Destnivîsên Helbesta Kurdî ya Gelêrî yên di Koleksiyona Aleksandre Jabayî de û Nusxeya "Kilamê Kîçan"ê ya bi Hejmara Kurd 49ê, Kovara IJOKSê cild: 4, jimar: 1, 2018 (r. 176-199) SORANÎ

ÖZTÜRK, Mustafa, Çîrokên Werger ên Mela Mehmûdê Bazîdî (1797-1870), Kovara EZZUBê cild: 4, jimar: 8, 2018 (r. 33-63) KURMANCÎ

PERTEV, Ramazan, Xebateke Giring di Dîroka Folklorê Kurdî de: Kemal Fewzî û Berhevkariya Çîrokên Kurdî, Kovara EZZUBê cild: 2, jimar: 3, 2016 (r. 44-61) KURMANCÎ

PERTEV, Ramazan, Celadet Alî Bedir-Xan Danerê Termînolojiya (Zaravenasiya) Folklorê Kurdî, Kovara JMSyê cild: 2, jimar: 1, 2017 (r. 17-31) KURMANCÎ

QADIR, Zîrar Esrîn, Azadî le Komelgey Kurdistanî da-le Ber Roşnayî Tiyorî Grêbestî Komelayetî John Locke, Kovara IJOKSê cild: 4, jimar: 1, 2018 (r. 140-152) SORANÎ

QADIR, Esrîn Zîzar-Selîm P. ALLAS, Xwêndineweyek bo Çimikî Yasa Layî John Locke-Rewşî Yasayî le Herêmi Kurdistan be Nimûne “Niwêjîneweyekî Tiyorîye”, Kovara IJOKSê cild: 5, jimar: 1, 2019 (r. 1-10) SORANÎ

QADIR, Mehdî Mihemed-Fetah Behram XEDIR, Serdemî Dawîy Osmanî Barûdoxî Aborî le Hewlêr, Kovara IJOKSê cild: 5, jimar: 1, 2019 (r. 213-236) SORANÎ

QAZÎ, Hesên, Şîfî Xoş: Kurte bîrewerîyekî Mamoste Emîr Hesên-pûr, Kovara Derwazeyê Jimar: 2 Nîsan 2018 (r. 158-168) SORANÎ

RESÛL, Helmet Bayz, Pirsî Xwendin û Pêşkewtinêy Zimanî Nûsiy Kurdî le Nimûney Çend Rojname û Govarêkî Seretay Sedey Bîstem da, Kovara IJOKSê cild: 2, jimar: 3, 2016 (r. 58-79) SORANÎ

RESÛL, Prof. Dr. Yadiğâr-Mamoste Kurdistan EBDULWEHAB, Şêwazî Şî’re Kurdiyekanî Tahîr Begî Caf, Kovara EZZUBê cild: 4, jimar: 8, 2018 (r. 85-112) SORANÎ

REŞİTOĞLU, Sevda Orak, Di Edebiyata Yarsanan de Kêlamên Jinan: Mînaka Remzbarê, Kovara JMSyê cild: 2, jimar: 2, 2017 (r. 71-87) KURMANCÎ

RÊZAN, Osman Mistefa, Karîgerî Perwerde le Binyatî Tak da be Nimûney Kurdistanî Başûr: Lêkolîneweyekî Şikariyî Rexneyî ye, Kovara IJOKSê cild: 2, jimar: 3, 2016 (r. 209-218) SORANÎ

SAGVAN, Umêd, Rêgezên Dramayê di Avakirina Çîroka Eyloyê Pîr da, Kovara Kadim Akademiyê cild: 2, jimar: 2, 2018 (r. 164-176) KURMANCÎ

SALIH, Selîm Reşîd-Ebdullah Rehman AWLA, Barûdoxî Komelahey le Pantay Deqî Romanî Kurdî da, Kovara IJOKSê cild: 4, jimar: 2, 2018 (r. 386-415) SORANÎ

SALIH, Azad Ubed-Xoşeng Salih Muhammed ŞARI-AL-NAJAR, Bizavî Edebî Kurdî le Şarî Bexda (1958-1975) (lêkolîneweyek Mêjoyî ye.), Kovara IJOKSê cild: 4, mijar: 2, 2018 (r. 507-533) SORANÎ

SEÎD, Mihemed Ehmed, Sîmaw Watay Hendê Wişey Lêkçû Lay Ehmedê Xanî û Mewlewî, Kovara IJOKSê cild: 2, jimar: 3, 2016 (r. 179-195) SORANÎ

SEÎD, Newzad Weqas-Rêbiwar Mihemed ÎSMAIL, Şî’rî Kurdî, le Riwangey Pêwerekani Devêtî be Nimûney Devî Şî’rî le Kurmancî Xwarû da, Kovara IJOKSê cild: 5, jimar: 1, 2019 (r. 78-102) SORANÎ

SEÎD, Newzad Weqas-Hîwa Nureddîn EZÎZ, Karîgerîya Xetên Helbesta Klasîk li ser Mûsîqa Aktivatorên Xeşûyê, Kovara IJOKSê cild: 5, jimar: 1, 2019 (r. 194-212) SORANÎ

SEÎD, Îsmail Abdulreman, Karîgerî Bîr û Endîşey Çep le ser Rêkxirawey Kurdiyekanî Rojhilatî Kurdistan (1938-1945), Kovara IJOKSê cild: 5, jimar: 1, 2019 (r. 253-289) SORANÎ

SEPTİOĞLU, Pervin, Varyantê Vistonika Waya Hewt Birayan Ser o Yew Muqayese, Kovara EZZUBê cild: 3, jimar: 6, 2017 (r. 95-108) ZAZAKÎ

SERFIRAZ, Mesûd, Lahûtî Xanê Kirmaşanî: Salên Wî li Stenbolê û Têkiliyên Wî bi Dêrdorên Kurdî re (1918-1919), Kovara Derwazeyê Jimar: 1, Gulan 2017 (r. 140-146) KURMANCÎ

SERFIRAZ, Mesûd, Stranên Kurdî di Arşîva Alexandire Jaba de: Kataloga Şeş Destxetan, Kovara Derwazeyê Jimar: 3, Adar 2019 (r. 105-121) KURMANCÎ

SEZER, Müslîh, Ji Herêma Behdînanê Helbestkarekî Pirziman: Seyfiyê Şoşî, Kovara EZZUBê cild: 2, jimar: 3, 2016 (r. 131-147) KURMANCÎ

SIDÎQ, Farûq Omer-Mistefa Raza Mistefa, Prose Morfolojîyekanî Çalakîyî û Sistîyî Morfeme Bende Ferhengiyekan le Berhemhênan û Dariştinî Datay Niwêyî Zimanî da, Kovara IJOKSê cild:4, jimar: 1, 2018 (r. 118-143) SORANÎ

SÖNMEZ, Nesim, Pirsîrêkên Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî di Zanîngehên Tirkiyeyê de, Kovara IJOKSê cild: 2, jimar: 1, 2016 (r. 96-104) KURMANCÎ

SÖNMEZ, Nesim- Resul GEYİK, Xebateke Berawirdkarî û Dijberhevkarî li ser Demên Îngilîzî û Kurmancî, Kovara Nûbihar Akademîyê cild: 2, jimar: 5, 2016 (r. 82-110) KURMANCÎ

SÖNMEZ, Nesim, Tehlîla Nehcu'l-Enama Mela Xelîlê Sêrtî, Kovara EZZUBê cild: 4, jimar: 7, 2018 (r. 67-85) KURMANCÎ

SÖNMEZ, Nesim, Mela Ebdullahê Kotaliyê û Helbestên Wî yên Kurmancî, Kovara Nûbihar Akademîyê cild: 3, jimar: 9, 2018 (r. 97-114) KURMANCÎ

SUBAŞI, Kenan, Vegotina Hêmayî û Metaforîk di Mamikên Kurdî de, Kovara JMSyê cild:1, jimar: 1, 2016 (r. 71-90) KURMANCÎ

SUBAŞI, Kenan, Kurtedîroka Çapemenî û Medyaya Zarokan a Kurdî, e-Şarkiyat Cild: 9, jimar: 1(17), Nîsan 2017 (r. 107-132) KURMANCÎ

SUR, Mihemed Abdullah Kake-Sinur Sabah SIDÎQ, Mêjûy Yasaw Rênimawekanê Perwerdew Programekanê Xwedînêy Fermî le Şarî Hewlêr Salanî (1961-1968), Kovara IJOKSê cild: 5, jimar: 1, 2019 (r. 167-193) SORANÎ

ŞARMAN, Nurdan, Analîza Strana Ez Xelef im li ser Şopa Dîroka Kurdan a Sedsala XIXem, Kovara Nûbihar Akademîyê cild: 1, jimar: 3, 2015 (r. 75-100) KURMANCÎ

TAN, Sami, Yekemîn Berhema Rêzimana Kurmancî ya bi Îngilîzî, Kovara JMSyê cild: 3, jimar: 2, 2018 (r. 03-19) KURMANCÎ

TARDUŞ, İbrahim, Taybetiyên Lehengên Tradîsyonel di Vegotina Kurdî de, Kovara JMSyê cild: 3, jimar: 1, 2018 (r. 57-76) KURMANCÎ

TEK, Ayhan, Li Dor Behra Patronajê Mem û Zîna Ehmedê Xanî, Kovara Mukaddimeyê, cild: 2, jimar: 3, Bihar 2011 (r.41-59) KURMANCÎ

TEK, Ayhan, Evdirrehîm Rehmî Hekkarî û Berhemên Wî yên ji bo Biçûk, Ciwan û Jinan, Kovara JMSyê cild: 4, jimar: 1, 2019 (r. 51-71) KURMANCÎ

TEMO, Selim, Romanek û Fîlmê Xwe: Vegotin, dîtin û Temsîl, Kovara Mukaddimeyê cild: 2, jimar: 4, Payîz 2011 (r. 61-81) KURMANCÎ

VAROL, Murat, Şiîrê Mulemma ê Şaîranê Edebiyatê Zazakî, Kovara EZZUBê cild: 3, jimar: 6, 2017 (r. 51-65) ZAZAKÎ

VEROJ, Seîd, Rojnamevanekî Sîyasetmedar û Rojnameyeke Muxalif: Mewlanzade Rifat û Rojnameya Serbestî, Kovara Nûbihar Akademîyê cild: 2, jimar: 6, 2016 (r. 46-70) KURMANCÎ

XERÎB, Dilşad M.-Mihemed MEHWÎ, Tesnîfkirina Dengdêr û Dengdaran di Binyata Kiteyan de, Kovara IJOKSê cild: 4, jimar: 1, 2018 (r. 28-43) SORANÎ

XOŞNAW, Hêmin Omer, Çend Layenêkî Jîyanî Mehiwî le Belgenamekanî Osmanî da, Kovara Kadim Akademîyê cild: 2, jimar: 2, 2018 (r.177-207) SORANÎ

XURŞÎD, Ebdullah- Şehla Welî CEBAR, Çemkî Şêwazî Jiyan (Twêjîneweyekî Tiyoriye), Kovara IJOKSê cild: 4, jimar: 2, 2018 (r. 350-364) SORANÎ

YAKIŞAN, Bilal, Estanîkanê Zazakî di Motîfê Lu, kovara EZZUBê cild: 4, jimar: 7, 2018 (r. 99-111) ZAZAKÎ

YERGÎN, Mehmet, Mewlidê Mela Ehmedê Xasî de Tesîrê Mewlidê Mela Huseynê Bateyî, Kovara IJOKSê cild: 1, jimar: 1, 2015 (r. 96-118) ZAZAKÎ

YILDIRIMÇAKAR, Mehmet, Heyranok ji Hêla Ziman, Şêwaz û Naverokê ve: Nimûneya Herêma Wanê, Kovara Nûbihar Akademiyê cild: 2, jimar: 7, 2017 (r. 79-91) KURMANCÎ

YILDIZ, Ayhan, Ciyê Eqîdenameyan di Edebiyata Kurdî û Perwerdehiya Medreseyan de, Kovara Nûbihar Akademiyê cild: 3, jimar: 9, 2018 (r. 59-96) KURMANCÎ

YILDIZ, Reşit Rojdar, Di Helbestên Melayê Bateyî de Evîn û Hezkirin, Kovara EZZUBê cild: 1, jimar: 2, 2015 (r. 183-193) KURMANCÎ

YILMAZ, Ferhat, Lêkolîneke Berawirdî li ser “The Interlopers” û “Bêbextî”yê, Kovara Nûbihar Akademiyê cild: 2, jimar: 8, 2017 (r. 81-95) KURMANCÎ

YÜKSEL, Metin, Hinek Pirsên Lêkolînên bi Kurdî: Pêdeçûneke Rexneyî li ser Bajâr-Edebiyat û Cizîra Botan ya Zülküf Ergün, Kovara Derwazeyê Jimar: 1, Gulan 2017 (r. 172-179) KURMANCÎ

YÜKSEL, Metin, Ji Dawîya Împeratorîyan Heta Pêşketina Netewe-Dewletan: Têkiliyên Tirkîye û Îranê di Çavkaniyên Farisî de, Kovara Derwazeyê Jimar: 3, Adar 2019 (r. 82-91) KURMANCÎ

ZEVENKÎ, safîa, Wateyên Nişanên Xwedê di Helbesta Cizîrî de, Kovara Mukaddimeyê cild: 8, jimara taybet, 2017 (r. 119-131) KURMANCÎ

2. Pirtûkên Zanîngehan

Zanîngeha Mardin Artuklu

Kadri Yıldırım, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi*, Mardin Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, Mardin 2013.

Ahmet Kasimoglu/Ehmedê Dirihî, *Kürtçe Bitki Adları Sözlüğü- Kürtçe Bitki Adları Sözlüğü*, Mardin Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, Mardin 2013.

Kadri Yıldırım, *Tiba Melayê Erwasî Melayê Erwasînin Tıp Kitabı (18.yy)*, Mardin Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, Mardin 2013.

Nadire Güntaş Aldatmaz, *Sanîkanê Namekîye Ra-Mamekiye Masallarından*, Mardin Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, Mardin 2013.

Kadri Yıldırım, Ramazan Pertev, Mustafa Aslan, *Folkloru Kurdî-Ji Destpêkê Heta Niha*, Mardin Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, Mardin 2013.

Pirtûkên Dersên Ziman û Zaravayên Zindî yên li Tirkîyeyê

Ji bilî van berheman çend berhemen pîrzimanî hene. Di van berheman de jî gotarên Kurdî hene.

Wekî mînak:

Süryani Arap ve Kürt Klasikleri

Dil Bilimleri

Zanîngeha Bîngolê

1- Diwon Cepexçuri, Abdulaziz Beki, 2015

2- Gramera Çepaxçûrî, Abdulaziz Beki, 2015

3- Pirtûkên Dersên Ziman û Zaravayên Zindî yên li Tirkîyeyê

Li gora agahiyên me di zanîngehên din de pirtûk nehatine çapkirin. Lê heya niha xwendekarên doktarayê yên zanîngeha Dicleyê, spartek û xebatên xwe wekî pirtûka didin çapê. Pirtûkên xwendekarên doktorayê yên Dicleyê ev in.

- 1- Waneyên Zimanasiyê
- 2- Gotarên zimanasiyê.

Ji bilî van berheman çendi projeyên din ên xwendekar û mamosteyan hene. Wan niyet heye heya dawiya vê salê wekî pirtûk bidin çapê.

Encam

Nirxandina Tezan

Ev xebatên tezan di nav vî deh salî de gellek tiştan derxistîye û bi saya van tezan agahî bi awayekî akademîk û sistematîk zêde dibin. Ev giş kom dibin ku mirov bibe xwedîyê nêzîkatîyek rast.

Di vê pêvajoyê de, li zanîngeha Mardin Artukluyê 72, Yüzüncü Yılê 56, li Zanîngeha Bingölê 47, li Muş Alparslanê 19 û li Dicleyê jî 7 tez bi tevahî jî 201 tez hatine amadekirin.

Wekî mijaran jî, mijarên herî zêde ev in; di edebîyata modernê de 73 tez, di zimannasîyê de 48 û di edebîyata klasîk jî 41 tez hatine amadekirin. Wekî hejmara herî kêr jî 1 tez li ser wergernasîyê û 1 tez jî li ser edebîyata zarokan hatiye amadikirin.

Dema zimanê tezan bê nirxandin, 46 tez ji aliyê xwendekarên Soran bi zimanê ku em dikarin wekî Sormancî bi nav bikin hatiye nivîsîn. Bi kurmancî 44 û bi Soranî jî 10 tez hatine amadekirin.

Nirxandina Gotaran

Hejmara gotarên ku hatine çapkirin di sala 2010an de 2 gotaran destpê dike û 2011 û 2012an jî yanî 3 sal peyhev 2 gotar çapkirine û hejmara herî zêde jî 2018an de bi tevahî 53 gotar hatine çapkirin. Tiştê balkêş di sala 2013an tu kovar qet ti gotaran çapnekirine.

Heger em gotaran di ware zimanên ku hatine nivîsîn binirxînin, em dibînin ku Kovarên Nûbihar Akademî û JMSyê bi 26 gotarên Kurmancî kovarên ewil in, Kovara EZZUBê 9 gotaran bi Zazakî û kovara IJOKSê jî bi 41 gotarên Soranî rêza ewil digirin.

Kovarên JMSyê û Derwazeyê qet bi Zazakî û kovarên e-şarkîyat û Mukaddîmeyê jî qet bi Soranî gotar çap nekirine.

Dema mirov li mijaran dinêre, kovara **IJOKSê** di qada “Dîrok/Jînenîgarîyê” de 12 gotar, di qada “Folklorê” de 12 gotar, di qada “Perwerdehîyê” de 5 gotar û di qada “Zimannasîyê” de 6 gotar; Kovara **EZZUBê** di “Edebîyata Klasîk” de 10 gotar; Kovara **Nûbihar Akademîyê** do “Edebîyata Modern” de 6 gotar û Kovara **JMSyê** di “rêzimanê” de 4 gotar çapkirine. Ev hejmarên herî zêde ne.

Bi tevahî 201 gotar di kovaran de bi her zaraveyan hatine çapkirin.



Kovara KurdiNameyê ya Navnetewî
Uluslararası KurdiName Dergîsi
International Journal of KurdiName

Uluslararası KurdiName Dergisi
Sayı: 1 Kasım 2019



International Journal of KurdiName
Issue: 1 November 2019

BERAWIRDKIRINA ÇİROKA ELİK û FATİK A KURMANCÎ û HANSEL û GRATEL A BIRAYÊN GRIMM -LI GOR MOTÎF INDEKSA STITH THOMPSON-¹

THE COMPARISONS OF THE TALE OF ELİK AND FATİK IN THE KURMANCİ DIALECT OF KURDISH AND TALES OF GRIMM BROTHERS HANSEL AND GRATEL –IN ACCORDANCE WITH STITH THOMPSON MOTIF INDEX

Veysel TANRIKULU*

Kurte

Armanca me bi vê xebatê yek bi Kurdiya Kurmancî yek jî bi Elmanî berawirdkirina du çîrokan e. Çîroka bi Elmanî ya bi navê Hansel û Gretel wê ji alî Birayên Grimm ve hatiye berhevkerin, çîroka bi Kurdî jî bi navê Elik û Fatik tê zanîn. Xebata me jî girîngiya çîrokan ji bo kurdan, berawirdkirina çîrokan bi riya motifan û encamê pêk tê. Çîrokên her du gel li gor Motîf Îndeksa Stith Thompsonê hatiye berawirdkirin. Li gorî Motîf Îndeksa Stith Thompsonê motifên hevpar û ji hev cuda hatine tespîtkirin. Ev çîrok dê nîşanî me bide ku çîrok xwe bi welatek tenê sînor nekiriye. Gihiştî ye her derê cihanê. Di vê xebatê de dewlemendiya çîrokên kurdî alî motifan de hat dîtin.

Peyvên Sereke: Çîrok, Elik û Fatik, Birayên Grimm, Hansel û Gratel, Berawirdkirin

Abstract

In this article two tales have been compared in terms of motifs used in them. One of the tales Elik and Fatik is in Kurmanci Kurdish and the other one is Hansel and Gratel is in German. Ourwork include importance of tales for Kurds, comparison of tales and epilogue. The both of tales have been compered according to Stith Thompson's list of motifs of tales. Similar and different motifs in both tales have been included in this work. In this work it can be seen once more that a tale does not limit itself with a country and get spreaded all over the world.

Keywords: Tales, Grimm Brothers, Elik and Fatik, Hansel and Gratel, comparison

¹ Ev gotar ji beşek teza bi navê “Kürtçe Masallar ile Grimm Kardeşler Masallarının Motifler Açısından Karşılaştırılması” hatiye wergirtin.

*Mamoste, Milli Eğitim Bakanlığı, İstanbul, Türkiye. E-mail: veyseltanrikulu@hotmail.com

KÜRTÇENİN KURMANCÎ LEHÇESİNDEKİ ELİK Û FATİK MASALI İLE
GRİMM KARDEŞLERİN HANSEL VE GRATEL MASALININ KARŞILAŞTIRILMASI –
STİTH THOMPSON’UN MOTİF İNDEKSİNE GÖRE-

Özet

Bu makalede iki masal motifler yönünden karşılaştırılmıştır. Bu masallardan biri, Kürtçenin Kurmancî lehçesinde söylenegelmiş olan Elik ve Fatik masalıdır, bir diğeri de Almanca söylenegelmiş olan Hansel ve Gratel masalıdır. Çalışmamız; masalların Kürtler için önemi, masalların karşılaştırılması ve sonuç bölümünden oluşmaktadır. Her iki masal Stith Thompson’un masal motifleri listesine göre karşılaştırılmıştır. Bu çalışmada her iki masaldaki benzer motifler ve birbirinden farklı motiflere yer verilmiştir. Bu çalışmayla bir kez daha bir masalın bir ülkeyle kendini sınırlamadığı ve dünyanın her yerine yayıldığı görülecektir.

Anahtar Sözcükler: Masal, Grimm Kardeşler, Elik ile Fatik, Hansel İle Gratel, Karşılaştırma

Destpêk

Folklor an jî zargotin, ji ber ku di nava xwe de zanistiya gel vedişêre bala hemû gelên li cihanê dikişîne. Ev zanistî di rojekê de ava nebûye. Roj bi roj, sal bi sal, nîş bi nîş, ji hezar salan bi vir de zanyariya civakê xwe dewlemend kiriye. Di nava vê zanista jiyanê de bi mirov re eleqedar her tişt heye. Xweza, dawet, merasîmên mirinê, zarokanîn, mezinkirina zarokan, navlêkirin, têkiliyên bi dijmin re, jiyana rojane, hûner û pîşe bi tevahî ev zanist di nav xwe de hembêz kiriye. Gelên ku xwendin û nivîsandin pir bikar neanîne, berê xwe dane van berhemên devkî û nîş bi nîş ew berhaman gihandine heya vê rojê.

Wêjeya devkî demeke dirêj ji alî dîroknan ve wek agahiyên jênebawer dihat dîtin û di lêkolînên akademik de wek çavkanî nedihat qebul kirin. Lêkolîner tenê ji çavkaniyên nivîskî bawer dibûn. Piştî xebata Jan Vansina û Alessandro Portelli ev nêrin şikest. Xebatên Vansina û Portelli destnîşan kir ku çîrok dikarin ji beriya dîrokê agahî bidin. Ev dîrok ne dîroka kesên ku bi hêz û dewlemenda ne, ev dîrok dîroka gelên gundî û mirovên ji rêzê ne (Hamelink, 2016: 10-11).

Gelê kurd jî ji ber sedemên dîrokî, erdnigarî, siyasî hwd. bi piranî berhemên devkî pejirandiye û afirandine. Çanda kurd di wêjeya devkî de ewqas xwe xurt kiriye ku ev mijar bala lekolînerên Ewrûpaî jî kişandiye.

Bazil Nikitin di derheqê vê mijarê de dibêje, lekolînerên ku wêjeya kurdi dikolînin, dibînin ku tiştê herî bi bandor “zêdebûna folklorê” ye (Nikitin, 1986:490, veguhêzer Uzun, 2013: 41).

Çîrok, ji destpêka xebata folklorê heya niha qada folklorê dewlemend kiriye. Heta em dikarin bibêjin ku derketina folklorê bi saya çîrokê ye. Birayên Grimm sala 1812an de çîrok komkirin û weşandin. Ev xebat wek destpêka dîroka folklorê jî tê pejirandin (Aslan, 2014: 12).

Di nava folklorê de tiştê ku cihê herî taybet jî çîrok e. Di çîrokan de xeyalên mezin, derasayiyên rengîn gelek cih digrin. Ev taybetiya çîrokan cihê çîrokan girîngtir dike. Bê guman hemû vegotinên gelerî girîngin, lê cihe çîrokan cuda ye. Ji ber ku berî her tiştî xeyalên hevpar a mirovahîye ye. Mîrateya hevpar a herî mezin a gelan e.

1. Girîngiya Çîrokan Ji Bo Kurdan

Wek hemwateya “tale”ya îngilîzî, “marchen”a almanî, “masal”a tirkî de, di kurdî de nêzike 20 nav hatiye bikaranîn. Hejmarekî ewqas zêdeyî girîngiya çîrokan ji bo kurdan tîne ber çavan. (Çîrok, çirçironik, dastan, xeberoşk, çêrçerok, çîronk, çîvanok, qewatî, be ser hat, meselok, xeberoşk, çîrwanok, çîrçîrok, serborî, metalok, kurteçîrok, xemisok, mesel, serpêhatî, hikaye)

Bê guman sedemên pîrbûna navan hene. Bo me sedema yekemîn kêmbûyîna berhemên nivîskî ne. Ji ber ku nivîs di nava gelê Kurd de zêde nehatiye bikaranîn, gelê kurd çand, dîrok, tecrubeyên xwe bi riya devkî û bi çîrokan gihandîyê roja me ya îro. Em bi riya wan berhaman li ser dîrok, mîtolojî û destanên kurdan agahî digrin. Sedemeke dinê jî dîsa bo me, çîrok bi gelemperî ji bo perwerdekirina zarokan hatiye bikaranîn. Vêca ji bo hezkirin û pêşirînkirina zarokan ji bo çîrokê navên balkêş wekî çirçîrok, çîvanok, çêrçerok, çîronk, çîvanok û hwd hatine û tînan bikaranîn (Kızıl, Tanrıkulu, 2015: 73).

Rohat Alakom rol û erka çîrokên Kurdî wisa tespît kiriye:

“Di çîrokên kurdî de gelek erf û edet, rêvaçûn, karakter, nêrîn û dîtînen ser jîyîne hene. Civatê bi rêke hinerî, artîstîk, bi alîkariya zimanê çîrokan daxwazî û hêviyên xwe yê sedsale ji nû ve ji civatê re pêşkêş kiriye. Civatê bi dirêjahiya salan, bi hezaran çîrok afirandiye, angorî sal û zemanan hewcedariyên me yê hinerî bi cih aniye, di wî warî de em tîr kirine.”
(Alakom, 2002: 12)

Îzady di pirtûka xwe ya “Kurdan” de sedema taybetmendîya çîrokên gelerî erdnigarî nîşan dide û wisa şîrove dike: “firehtirîn beşa çîrokên gelerî yê kurd, em dikarin di bin navê “Kurdish winter stories-çîrokên zivistanê yê Kurdan” de berhev bikin. Lewra ev çîrok bi gelemperî di şevên dirêj û sar û xetere yê zivistanên Kurdan de tê vegotin. Ev çîrok behsa serkeftin û tîkçûnên lehengan dikin. Di van çîrokan de, ji bo guhdarvanan di dawiyê de gelek gotinên bi şîret, bi mesaj û rê û rêbaz hene ku mirov bi wan xwe ji şertên demsala zivistanê diparêzin (Îzady, 1992: 239).

Çîrokên Kurdî ne bi tenê ji bo pêdiviyên berê ji bo pêdiviyên modern jî dibin alîkar. Ji ber ku gelê kurd derengmayî derbasî nivîsandina roman, kurte çîrok û şanoyê bû, tîkilîya wî/wê bi çîrok re tu car wenda nebû. Ev tîkilî ji bo nivîskarên îroyîn jî bûye çavkaniyeke mezin û ev çîrokan xwistine nava mijara roman, kurte çîrok û şanoya xwe.

Yek jî ji çîrokan sîdê werdigire hûnera şano ye. Îro ji bo “şanoya zarokan” çîrokên kurdî bûne çavkaniyeke mezin, gelek derhêner çîrok veguherandine şanoya zarokan. Nivîskar û derhêner Çetoyê Zedo çîroka Şengê û Pengê kiriye wek lîstika zarokan û li ser dikê pêşandiye.² Heman çîrok ji aliyê Navenda Çand û Hunera Laleşê ve jî hatiye pêşandan.³

Yek ji wan çîrokên ku şanoya wan hatiye çêkirin jî “Pîrê û Rovî” ye. Koma şanoya bi navê ‘Zimzim’ ê ku li Mêrdînê xebatên xwe didomîne, di sala 2015an de jî çîroka bi navê ‘Pîrê û Rovî’ lîstine. Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê jî bi zazakî ‘Pîrê û Luvî’ lîstine. Çîrokên gelerî di nav

² Ji bo lîstika Çetoyê Zedo bnr: (<https://www.youtube.com/watch?v=izoWNbi91Jo>) Dîroka Lênerîne: 05/08/2016

³ Ji bo lîstika Navenda Çand û Hunera Laleşê bnr: (<https://www.youtube.com/watch?v=go6e9VwZWFY>) Dîroka Lênerîne: 05/10/2016)

weşanên TV de jî tîn bi kartînin. Di Zarok Tv de bernameyek 'Hebû Tune bû' jî her roj di saeta 21.00an berî xewan derdikeve pêşberî zarokan (Keskîn: 2016: 62).

Qadekê din a ku ji çîrokan sûd tê wergirtin sînema ye. Çîroka gelerî ya bi navê “Pepûk” ji alî sînemager Özkan Küçük ve bûye mijara filmek û navê film jî Pepûk e.⁴

Ev mînakên ku me li jor dane girîngiya çîrokan a ji bo me netewa kurdan dest nîşan dide.

2. Çîroka Hansel û Gratel a Bi Elmanî û Elik û Fatika Bi Kurdî

Çîroka me yek a Almanya ye û bi navê Hansel û Gratel tê zanîn. Berhevkarê vê çîrokê yek Jacop Ludwing Grimm (1785-1863) e, yê din jî Wilhelm Karl Grimm (1786-1859) e. Her du lekolîner bi xebatên xwe yên folklorîk gelek navdar in û li her derê cihanê bi navê Birayên Grimm tîn zanîn.

Birayên Grimm li gundên Almanyayê geriyan û xeberoşk, efsane û menqîbeyên bi Elmanî berhev kirin û bi navê Kinder und Husmarchen (Çîrokên ji bo Zarok û Maliyan) weşandin. Xebatên herdu birayan pêşanga ekola romantizma Elmanî tîn qebûl kirin (Yıldırım, Pertev û Aslan, 2013: 20). Birayên Grimm li gor teoriyên belavbûna çîrokan de jî teoriya “Nêrîna Beriya Dîrok” ê parastine (Sakaoglu, 1999: 5).

Çîroka me ya din jî bi kurdiya kurmanciye û bi navê “Elik û Fatik” tê zanîn. Gelek varyantên vê çîrokê hene. Min varyanta Fedlî Zaman a ku ji xebata wî ya di Mînakek ji Çîrokên Kurdan de cih dabû çîroka Elik û Fatik hilbijart (Zaman, 2016: 116-121). Varyanta din a çîroka Elik û Fatik di xebata Ömer Gezgin û Hayrettin Kızıl de hatiye weşandin (Gezgin û Kızıl, 2016: 219-220).

Çîroka Elik û Fatik a din jî ji aliyê Cihan Yıldırım ve di sala 2009an de di weşanên şaredariya kayapınare ve weşandiye (Yıldırım, 2009). Varyanta din a çîroka “Elik û Fatik” ji aliyê kurdên Xorasanê ve jî tê zanîn. Grafikerê Weşanxaneyê Hîva'yê Ridwan Polat di hevpeyvîna xwe ya ku bi Yeni Özgür Politika re kiriye dibêje ku, “*ez baş dizanim varyantên çîroka Elik û Fatik li Xorasanê jî tê qalkirin*”⁵

Ji ber ku varyanta Fedlî Zaman nezîktirîn çîroka Birayên Grimm bû min ya varyanta Fedlî Zaman hilbijart.

2.1. Berawirdkirina Herdu Çîrokan

Li ser çîrokên ku dişibin hevdu û welatê wan cuda ye, gelek teorî hatiye hilberîn. Li ser vê mijarê Gedeon Huet nêrîna lêkolîneran di bin sê serenavan de senifandiye: “Nêrîna Beriya Dîrokê (Dibistana Mîtolojî), Nêrîna Dîrokî (Dibistana Hîndolojî), Nêrîna Etnografîg (Dibistana Antropolojî).” (ji bo agahiyên berfireh bnr. Sakaoglu, 1999:5-7).

Nêzikî 100 sal berê, manenda çîrokên kurdî bi çîroka gelên din re, bala lekolînerên kurd jî kişandiye. Kemal Fewzî sala di 1918 de di kovara Jînê de derhaqê vê mijarê de wisa dibêje:

⁴ Filma Ozkan Küçük bnr: (<https://vimeo.com/76777700> Dîroka Lênerînê: 01/08/2016)

⁵ Hevpeyvîna Ridwan Polat bnr: (<http://www.yeniozgurpolitika.org/index.php?rupel=nuce&id=53259/> Dîroka Lênerînê: 05/08/2016)

“Ji serdemên berê ya kurdan de jî mefhûmên wek Kea, Rea, Hîra, Apollon, Mînrew, Zeus hwd. hene. Merîfet ew e ku ev xurafeyên ha, bi awayekî zanistî li ber çavan werin raxistin.” (Fewzî, 1918:8).

Li ser berawirdkirina çîrokan ez û mamoste Hayrettin Kızıl bi navê “Berawirdkirina çîroka Hedlîlik Bedlîlik a bi Kurdî bi Gur û Heft Karikan a Birayên Grimm re” gotarek weşand. Lê ne bi tenê di vê çîrok de gelek çîrokên din ya kurdan de jî ev şibandin heye. Ev bi tenê ne kurmançî de zaravaya zazakî (kirmanckî) de jî heye. Çîroka Êşîke û Fatike çîrokeke bi zaravaya zazakiye û dişibe çîroka Cinderella ya Birayên Grimm.

Çîrokek din jî ya ku dişibe Cinderella, ya Zinarê Xamo ye. Zinarê Xamo di bloga xwe da bi navê “Elik, Fatik û Manga Belek” bi kurmançî du varyant weşandine.⁶ Çîroka ku Zinarê Xamo weşandiye û çîroka me bi aliye mijarê ve ji hev cudane. Bi tenê navlêkirin dişibe hevdu.

2.1.1. Kurtiya Çîroka Hansel û Gratel:

Li welatekî bi navê Hansel û Gratel xwişkek û birayek hebûn.

Ev malbateke feqîrbûn, bavê wan ezingvan bû. Piştî diya zarokan dimire û bavê wan dîsa dizewice.

Jinbav/damarî zarok nedixwestin û dixwest ku zarokan ji malê dûr bixe.

Bavê zarokan bi israrkirina jinbav/damarî nêçar dimîne.

Zarok, axaftina jinbav û bavê xwe guhdar dikin, Hansel bi şev kevirên zaxil/xîç kom dike, dixê bêrika xwe.

Jinbav serê sibê zarok ji xew şiyar dike û bi bavê wan re dişîne daristanê.

Hansel û Gratel ji bo riya mal windanekin ev kevirên ku komkiribûn li ser rê dirjînin.

Bav, zarokan li daristanê dihele û diçe, dema dibe şev zarok ditirsin, bi şopa keviran xwe digihînin malê.

Sibehtirîn dîsa ji mal derdikevin. Ji ber ku damarî derî mifte kiribû Hansel û Gratel nikaribûn keviran kombikin, dewsa keviran hurikê nan avetin ser rê. Lê çivîkan ew hurik xwarin.

Dema bû şev ji ber ku nîşan/şop tûnebû nikaribûn wegerin mala xwe. Bi taxminî di nav daristanê de dimeşin, çûçîkek dişopînin û paşê holika pîrhevok derdikeve pêşiya wan.

Ew holik bi nan û çorekan hatiye çêkirin. Hansel û Gratel zikê xwe bi wan têr dikin.

Dema pîrhevok ji holikê derdikeve zarokan digre.

Hansel û Gratel pîrhevok dixapînin û pîrhevok/cadû di nav agir de dimre.

Ji mala cadû/pîrhevok kevirên giranbûha digrin û diçin mala xwe bi keyfxweşî bi bavê xwe dijîn. (J. û W. Grimms, 1999: 38-42)

⁶ Ji bo varyantên Zinarê Xamo bnr: <http://zinarexamo.blogspot.com.tr/2011/03/elik-fatik-u-manga-belek.html/07/08/2016>) http://zinarexamo.blogspot.com.tr/2011/03/elik-fatik-u-manga-belek_16.html Dîroka Lênerînê: 07/08/2016)

2.1.2 Kurteya Çîroka Elik û Fatik:

Li welatekî bi navê Elik û Fatik xwişk û birayek hebûn.

Piştî mirina diya zarokan bavê wan diziwice.

Bavê zarokan bi keseke xirab re zewicî bû. Damarî li zarokan dixist û tadê li wan dikir.

Bavê Elik û Fatik cotkar bû, dema payizê genimê malbata Elik û Fatik şîn nebû, bavê wan jî berê xwe da ber ziyareta çavşîn.

Damarî bi armanca xilasbûna ji zarokan xwe dixê di şûna zîyaratê û dibêje:

“ji bo genimê te şîn bibe divê serê zarokên xwe jêkî.”

Damarî ji bo kuştina zarokan bav îkna dike, lê çivîk ji zarokan re armanca damarîyê dibêje.

Ji bo ji mal birevin Fatik kumê Elik direvîne, Elik jî pey wê dide ji mal dûr dikevin.

Di nava rêlekî/daristanê de diçin û diçin.

Di nava rêlê de mala pîrhevokê dibînin û dikevin mala wê.

Mala pîrhevokê tije hejîr û mewîjan e. Pîrhevok/cadû ji bo xwarinê wan digre.

Elik û Fatik pîrê dixapînin û pîrhevok di nav ava kelandî de dimre.

Elik û Fatik rojekê rastî kurê padişah tên, Fatik bi kurê padişah re Elik jî bi keçika padişah re dizewice. (Zaman, 2016: 116-121)

Dema em li çîrokan dinêrin herikandina bûyer, karakterên sereke, cihê bûyerê, heya binavkirina çîrokan jî yek e. Her du çîrok jî navên xwe ji karakterên çîrokê yên sereke sendine.

Çîroka bi Elmanî: **Hansel û Gratel** / Çîroka Kurdiya Kurmancî: **Elik û Fatik**

Di her du çîrokan da jî her du karakter xwişk û birayên hevdû ne. Ji wana Hanzel û Elik lawikin, Gretel û Fatik jî keçikin.

Karakterên ne baş di her du çîrokan da jî demarî/jinbav û pîra ser/cadûye.

Di her du çîrokan da jî bav kesekî bi rehm hatiye nîşandan.

Cihê bûyerê di her du çîrokanda jî mala pîrhevok/cadû ye. Di her du çîrokan da jî zarok li daristanê wenda dibin.

Di vê beşê de em ê berawirdkirina her du çîrokan li gorî “Kataloga Motifên Çîrokan ya Navnetewî” ya Stith Thompson bikin. Thompson pirtûka xwe ya Motif Index of Folk-Literature de ev motif rave kirine.

A. Motifên Mîtolojîk

B. Ajal

C. Qedexe Kirin

D. Sêhr

E. Mirin

F. Derasayî

- G. Hûtan
H. Ezmûnan
J. Biaqîl û Xêvok
K. Xapandin
L. Tersgerîna/Berovajîbûna Qederê
M. Destnîşankirina Dahatûyê
N. Sihûd û Qeder
P. Civak
Q. Xelat û Ceza
R. Dîl û Firaran
S. Zilma Neasayî
T. Zewac
U. Xwezaya Jîyanê
V. Ol
W. Taybetmendiya Karakteran
X. Qerf
Z. Komên Motîfên Curbecur (Alptekîn, 1997:299-300).

B. AJAL

Di her du çîrokan de jî motîfa ajal heye. Ev ajal wek karakterekî alîkar derdikeve pêşiya me. (B300 – 349. *Ajelên alîkar bi giştî*) Di her du çîrokan de jî riya rast nîşanî karakterên sereke didin. Di çîroka Hansel û Gratel de, Hansel û Gratel li ser riya ku herin mala xwe çemek derdikeve pêşiya wan. Ji bo derbûsbûna qeraxa din ji bilî werdek jî tu tiştek tuneye, werdek alîkariya wan dike, Hansel û Gratel derbasî qeraxa çem dibin. Karakterê dîtir jî çivîk e. Hansel û Gratel bi alîkariya çivîkê mala pîrhevokê dibînin. Çîroka Elik û Fatik de jî Elik û Fatik fêla damariyê bi alîkariya “çivîkê” hîn dibin. (B130. *Ajalên rastgo*) Di çîroka kurdî de ev ajal dikare biaxife. Çivîk ji Elik û Fatik re wisa dibêje:

“ji bo ku baran bibare û genim şîn bibe dê yekî ji we li serê zeviyê yekî ji we jî li binê zeviyê ser jê kin. Haya we jê hebe.”

C. QEDEXE KIRIN:

Di çîroka Hansel û Gratel de damarî ji bo zarok, kevîran kom nekin, derketina zarokan ji malê qedexe dike û derî kilît dike. Di çîroka Elik û Fatik de jî ji bo nekevin destê pîrhevok kenîn qedexe ye (C700 – C899. *Qedexeyên curbicur*). Fatik, Elik hişyar dike û dibêje:

“Heke tu bikenî û dengê me biçe Pîra sêr dê me bixwe”

E. MIRIN:

Di her du çîrokan de jî motîfa mirinê heye. Hem di çîroka Hansel û Gratel hem jî di Elik û Fatik de mirina karaktera nebaş, pîrhevok heye.

F. DERASAYÎ:

Di her du çîrokan de jî çavên pîrhevokê baş nabîne lê dikare zarokan bibîne, dikare wan zeft bike (F600. *Kesên xwediyê hêzên derasayî*). Di çîroka Hansel û Gratel de holika pîrê jî derasayî ye. Holik bi nan, bi şeker û çorekan hatiye avakirin. Di çîroka Elik û Fatik de jî nava holikê pîrê tije mewîj û hêjîr in. “*Ez ê yekî ji we biavêjim kewara mewîjan yekê ji we jî biavêjim kewara hêjîran.*” (F700 – F899. *Tişt û derên derasayî*).

G. HÛTAN:

Di her du çîrokan de jî wek karakterê xerab cadû/pîrhevok derdikeve pêşiya me (G200. *Cadû*). Armanca cadû/pîrhevokê, di her du çîrokan de jî zeftkirin û xwarina zarokan e (G240. *Xûyên cadûyan*). Cadû di her du çîrokan de jî zarokan zeft dike. Lê di her du çîrokan de jî cadû têk diçe. Zarok ji destê cadû xilas dibin (G270. *Rizgarbûn an jî revîna ji cadûyan*).

H. EZMÛN:

Di her du çîrokan de ezmûna bavan heye. Damarî, ji bo ji zarokan xilas bibe, ezmûnan derdixe hemberî bavê zarokan. Ev ezmûn jî terkkirin ango kuştina zarokan e. Bav di her du çîrokan de jî neçar dimîne şerta damariyê qebûl dike (H1050– H1089. *Peywirên paradoks*).

J. BIAQIL û XÊVOK:

Di her du çîrokan de jî zarok temsîlkirina zanabûnê ye. Zarok her çiqas biçûk bin jî bi zanabûna xwe ji her dafikan rizgar dibin. Di çîroka Hansel Gratel de zarok dema fêla damarî dibihîsin, ji bo vegeftina malê ewilî kevir, ya duduyan jî nan pey xwe dirjînin û dimeşin. Elik û Fatik da jî ji bo ji destê damarî xilas bibin, Fatik kumê Elik direvîne. Pey hev didin û ji malê dûr dikevin (J500– J599. *Îhtiyad û pêşbîn*).

Di dawiya her du çîrokan de jî zarok bi zanebûn tevdişerî û ji pîrê xilas dibin. Di Hansel û Gratel de, Gratel bi zanebûn:

“Ez nizanim bikevim nav firinê” û dema pîrhevok/cadû nîşana wan dide, zarok pîrê dixin nava firinê.

Di çîroka Elik û Fatik de jî dema pîrhevok dixwaze wan bixe di nava sîtila xwe ya li ber agir e. Gazî zarokan dike û dibêje:

“Zarokno! De ka derkevin ser vê hêlekanê ez we bihêjînim.”

Fatik bi zanebûn pîrhevokê re dibêje:

“pîrê em nizanin derkevin ser hêlekanê. Ewil tu derê ser hêlekanê em jî hîn bibin û derên serê” pişt re dema pîrhevok nîşana wan dide zarok benê hêlekanê dibirrin û pîrê dikeve nava ava kelandî (J1100– J1249. *Kesên zîrek û tevgerên wan*).

Di herdu çîrokan de jî zarok heman rêbaz bi kar tînin û di her du çîrokan de jî xwişk aqil dide birayê xwe.

Zarok di her du çîrokan de jî dewsa tiliyên xwe hestî û dûwa mişk nişan didin û pîrhevok jî ji vê tiştê bawer dike. Ev jî xêwokbûna pîrê/cadû nîşan dide (J1810. *Şaş femkirina fenomenên fizîkî*).

K. XAPANDIN:

Di her du çîrokan de jî pîrhevok bi riya xapandinê dixwaze zarokan bixwe (K930. *Kuştina zarok bi xayîntî*). Beriya xwarinê bi tiliyên zarokan qelew bûna zarokan dinêre. Di her

dû çîrokan da jî ji bo xapandina pîrhevok, zarok dewsa tiliyên xwe hestî (Hansel û Gratel), duvê mişk (Elik û Fatik) nîşan didin bi saya wan pîrê dixapînin.

Di her dû çîrokan de ji bo xapandina pîrhevokê, zarok ji xwesteka wê re “*em nizanin ka nîşana me bide.*” dibêjin. Zarok di her du çîrokan da jî pîrhevokê dixin nav dafika wê (K1600. *Xapînok dikeve dafika xwe*). Xilasbûna zarokan jî bi riya vê xapandinê pêk te (K500– K699. *Xilasî bi xapandinê*).

Di çîroka Elik û Fatik de bav dema diçe zîyaretê, dêmarî xwe dixwe dewsa zîyaretê û merik dixapîne.

N. SIHÛD û QEDER:

Di her dû çîrokan de jî bisihûd û bêsihûdbûna zarokan heye. Xizanbûna malbata wan, mirina diya wan, nebaşbûna damarî/jinbavê wan, bêsihûd angê bêqederbûna her çar zarokan nîşan dide.

Di heman demê de bisihûd in jî, ji ber ku hem dikarin ji pîrê xilas bibin, hem bi alikariya ajalan jî ji tengasîyê xilas dibin (N800– N899. Alîkar).

P. CIVAK:

Malbata her du çîrokan jî ji heman kesan pêk te. Malbat; bi bav, bi damarî, bi keçîkek û bi lawîkek pêk tê (P230. *Zarok, dê û bav*).

Q. XELAT û CEZA:

Her du çîrok jî bi xelat û cezayan dawî dibe. Her du çîrok jî bi cezakerina kesa xirab - pîrhevok- dawî dibin. Dawiya çîroka Hansel û Gratel zarok bi kêvirên giranbûha vedigerin malê ev xelata zarokan e. Dawiya çîroka Elik û Fatik de jî Fatik bi kurê padîşê re, Elik jî bi keçê padîşê re dizewicin û ev jî dibe xelata wan (Q100– Q199. *Xwezaya xelatan*).

R. DÎL û FIRARAN:

Di her du çîrokan da jî motîfa dîlgirtinê heye. Zarok ji aliye pîrhevokê ve dîl tînin girtin (R0– R99. *Dîl Girtin*).

S. ZILMÊN NEASAYÎ:

Di her du çîrokan de jî damariyên zordar, armanca kuştinên pîr xerab, zarokên avêtî û zordariyên pîr dijwar cih digirin. Her du damarî/jinbav tahdeyê li zarokan dikin, li wan dixin, ji bo ji zarokan xilas bibin mîrên xwe îkna dikin. Di her du çîrokan de jî armanca damarîyan mirina zarokan e. Di Hansel û Gratel de terikandina zarokan li daristanê û di çîroka Elik û Fatik de jî armanca serjêkirina zarokan zilmek neasayî ye (S300– S399. Zarokên kuştî an terkkirî).

Her çiqas karakter zarok bin jî xedariya damarî li ser wan kêmbê. Armanca cadû/pîrhevokê jî xwarina goştê zarokan e ev jî zilmek neasayî ye. Mirina cadû/pîrhevokê jî bi agir/ava kelandî çêdibe ev jî mirineke neasayî ye (S400– S499. *Zilmên giran*).

U. XWEZAYA JÎYANÊ:

Ev motîf jî bi riya dewlemendî û feqîrî derdikeve peşîya me. Di her du çîrokan de jî her du malbat feqîr in. Di dawiya çîrokan de jî zarok dewlemend dibin. (U0– U99. *Newekheviyên jiyanê*)

Z. KOMÊN MOTÎFÊN CURBECUR:

Di her du çîrokan de jî hejmarên formel hene. Hejmarên formel wekî; 2, 3, 7, 40 tê zanîn (Alptekîn, 1997:390). Ji ber ku di her du çîrokan de du zarok hene motîfa hejmara 2(du) hatiye bikaranîn. Di çîroka Elik û Fatik de daweta Fatik sê roj sê şevan didome li vir jî motîfa 3(sê) hatiye bikaranîn (Z0– Z99. *Formel*).

MOTÎFÊN JI HEV CUDA

Di vê beşê de jî motîfên ku di çîroka Hansel û Gratel de nîne, lê Elik û Fatik de heye cih bidin van motîfan.

T. ZEWAC

Di dawiya çîroka Elik û Fatik de Fatik bi kurê padîşah re, Elik jî bi qîza padîşah re dizewicin (T100– T199. *Zewac*). Hezkirina wan ji hev bi dîtina carekê taybetmendiya vê zewacê ye (T10. *Dilketin*). Daweta wan sê roj û sê şevan didome.

V. OL

Dema genimê malbata Elik û Fatik şîn nabe, bavê zarokan biryar dide ku here li ser zîyareta çavşîn û dia bike (V100–V199. *Avahî û heyberên ayînî*). Ji bo gihiştina meqsedên xwe dia kirin nîşana motîfa olî ye. Bi vê motîfê em dikarin agahiyê bigrin ji baweriyên kurdan ên berê. Nexwe, kurdan berê miradên xwe gihandine darekî ku ji wê bihêvî bûne. Çîroka Kurdî de navên ku hatiye bikaranîn –Elik, Fatik- ji navê du sahabeyên Hz. Ali ile Hz. Fatma hatiye girtin.

X. QERF:

Her çiqas di çîrokê de zilmêkî dijwar hebe jî bi riya qerfan ev zilm, bala zarokan nakşîne. “*lê eger beranberî tirsê balkişîn li ser henek û pêkenîkan be, hingê tirs sivik dibe û ji holê radibe.*” (Pertev, 2009:117). Di çîrokê de gotinên argo, axaftina çivîk hemanên qerfî ne.

Mînak:

Dema pîrê destara xwe digerîne û bi deng wisa dibêje.

Ez destara xwe digerînim

Tirên xwe dişeqînim

Yên dora xwe dikenînim.

Dema pîra ser ket nava ava kelandî ji zarokan re got:

-heta min devê bavê we de rî, we di devê min de rî.

Dema çivîkek hat û nêzikî Elik û Fatik bû û got:

Wîçî wîçan, wîçî wîçan

Bidin min parî û piçî nan

Ez ê ji we re bikim xeberdan

Di van metnên manzum de; di dawiya ristê, dawiya hevokan de ahengîyek jî derdikeve pêşiya me. Ev ahengî bi riya qafiye hatiye avakirin. Ji ber ku gotinên qafiye di hişê zarokan de bi hêsaniyê cih digrin ev gotinên bi qafiye hatiye bikaranîn.

Encam

Bi riya motîfan me ev jî dît ku çîroka kurmancî ya Elik û Fatik û ya elmanî Hansel û Gratel dişibin hevdû. Motîfên her du çîrokan ya hevpar nîşaneyê gerdûnbûna çîrokan e. Çîrokên kurdî jî parçeyê evê gerdûnbûyîne ye. Di pirtûka *Grimms Märchen International* de navê heft welatan derbas dike ku hin çîrokên li wir û çîrokên Grimm dişibin hev (Coşan, 2001:7). Di nav wan çîrokan de Kurdî tûne ne. Ji ber vê yekê, divê xebatên zanistî wekî berawirdkirina çîrokên bi kurdî û yên Birayên Grimm û çîrokên li welatên din zêde bibin.

Her çiqas çîrokên li cihanê bişibin hevdu jî çîrokên Birayên Grimm populertir in. Ji ber vê yekê hebûna çîrokên gelên din li ber windabûyîne ne. Ev windabûn di nav çanda kurdî de lêztire. Ji ber ku asimilasyona zimên û çandê îro jî didome. Ji ber vê yekê divê xebatên akademîk ên derhaqa çîrokên kurdî bê zêdekirin. Çîrokên kurdî bi filman, bi anîmasyonan, bi wênêçîrokan divê bêne mayîndekirin. Di mezinkirin, perwerdekirina zarokan de divê cihê bidin wan çîrokan. Ger em berdeamkirina çanda xwe dixwazin divê girîngî bidin çîrokên xwe. Dema em çîrokan windabikin em ê qencî, başî, zimanê zarokatî, heman û gotinên folklorîk wenda bikin. Dema ev tişt winda bibe nayên peyda kirine, çandek ji hole radibe, wenda dibe

Çavkanî

- Alakom, R. (2002). *Folklor û Jinên Kurd*. Stockholm: Weşanên Nefelê.
- Alptekin, A. B. (1997). *Halk Hikâyelerinin Motif Yapısı*. Ankara: Akçağ Yayınları.
- Aslan, F. (2014). *İstanbul'un Yüz Masalı*. İstanbul: İstanbul Büyükşehir Belediyesi Kültür A.Ş. Yayınları.
- Coşan, L. (2001). *Sınırları Aşan Bir Masal*. Ankara Üniversitesi Dil Dergisi. *Language Journal*. Sayı: 103. Ankara Üniversitesi Basımevi.
- Fewzî, K. (1918). "Kürd Masalları" *Jîn*, j. 22, r. 8-9, , amd. M. Emîn Bozarşan. (1988). Cild V, r. 934-935, Uppsala: Weşanxana Deng.
- Gezgin Ö. û Kızıllı H. (2016). "Çend Çîrok Bo Zargotinên Kurdan Ji Çavkanîyên Zindî", *Kürdoloji Akademik Çalışmalar (Ed. Hasan Karacan)*. İstanbul: Yargı Yayınları.
- Grimm J. & Grimm W. (1999). *Grimm Masallar (Kinder-Und Hausmärchen)*, c.I, Cumhuriyet Gazetesi, Dünya Klasikleri Dizisi.
- Hamelink, W. (2016). *Dengbêjler ve Sözlü Tarih*. M. Yüksel (Çev.). Kürt Tarihi Dergisi. 26,10-11.
- Izady, M. R. (1992). *The Kurds: A Concise Handbook*. Crane Russak, USA
- Keskin, N. (2016). Dî Çarçoveya Teoriya Performansê De Nîrxandîna Vegotinên Gelêrî [An Evaluation of Folk-narratives in the Frame of Performance Theory]. *International Journal of Kurdish Studies* 2 (1), pp.51 – 66.
- Kızıllı, H. & Tanrikulu, V. (2015). Berawirdkirina çîroka Hedlîlik Bedlîlik a bi Kurdî bi Gur û Heft Karikan a Birayên Grimm re [The Comparison of Bedlîlik and Hedlîlik of Kurdish and

The Wolf and The Seven Young Kids of Grimm Brothers]. International Journal of Kurdish Studies 1 (2), pp.70 - 85 .

Pertev, R. (2009). *Zarok û Çîrok*. Stenbol: Weşanên Dozê

Sakaoglu, S. (1999). *Masal Arastırmaları*. Ankara: Akçağ Yayınları.

Uzun, M. (2013). *Kürt Edebiyatına Giriş*. İstanbul: İthaki Yayınları.

Yıldırım, C. (2009). *Elik û Fatik*. Amed: Weşanên Şaredariya Kayapınarê.

Yıldırım, K; Pertev, R. & Aslan, M. (2013). *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*. Weşanên Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü, İstanbul.

Zaman, F. (2016). *"Mînakek Ji Çîrokên Kurdan"*, Kürdoloji Akademik Çalışmalar (Ed. Hasan Karacan). İstanbul: Yargı Yayınları.



**VEGÊRANA WELATPERWERÎYÊ Û FÊHMA ZIMAN DI HELBESTA
ŞIKOYÊ HESEN DE
(THE PATRIOTIC NARRATION AND LINGUISTIC INSIGHT IN ŞIKOYÊ
HESEN'S POETRY)**

Ahmet SEYARÎ*

Kurte

Şikoyê Hesen, kurdekî êzîdî û yek ji helbestvanên qonaxa Kafkasyayê ye. Bi navê “Qalçîçek”, “Tembûra Kurda”, “Meremê Dilê Kurd” sê berhemên wî yên helbestan hene. Di gelek helbestên Şikoyê Hesen de welatperwerî derdikeve pêş û helbestvan hest û nêrînen xwe yên di vî warî de bi vegêranekê di nav helbestên xwe de hunandine. Herwiha fêhm û hişmendîya ziman jî bûye temayeke sereke di helbestên Şiko de. Mijara vê xebatê vegêrana welatperweriyê û fêhma ziman di helbesta Şikoyê Hesen de ye. Pêşî derbarê jiyana Şikoyê Hesen de agahî hatine dayîn û navên berhemên wî yên ku heta niha hatine weşandin, hatine nivîsandin. Her wiha di helbestên Şikoyê Hesen de vegêranên ku hest û vegotinên welatperweriyê di wan de derdikevin pêş, hatine tesbîtkirin û şîrovekirin. Piştî helbestên Şikoyê Hesen ku di wan de fêhm û hişmendîya ziman derketiye pêş hatine tesbîtkirin û şîrovekirin. Ev xebat li ser du berhemên Şikoyê Hesen hatiye kirin. Yek jê berhema bi navê “Tembûra Kurda”, ya din a bi navê “Payîz û Ba” ye. Armanca xebatê di çorçoveya fêhm û hişmendîya ziman de ananîz û şîrovekirina helbestên Şikoyê Hesen e.

Peyvên Sereke: Şikoyê Hesen, helbest, vegêrana welatperweriyê, fêhma ziman.

Abstract

Şikoyê Hesen is Yazidi Kurdish and a poet of the Caucasia period. He has three poetry works entitled “Qalçîçek”, “Tembûra Kurda” and “Meremê Dilê Kurd” . In many of Şikoyê Hesen’s poems patriotism is a prominent topic and he builds up his feelings and ideas literally within this frame. Similarly the awareness and understanding of his language is another major theme in his poems. The topic of this study is the patriotic narration and linguistic consciousness in Şikoyê Hesen’s poems. Initially information is given about Şikoyê Hesen’s life and the names of his established poetry works up to now have been mentioned. Besides the narrative styles that include patriotic feelings and discourses in his poems have been detected and commented on as well. Subsequently his poetry works emphasizing awareness and perception of language have been detected and commented. This study is done on two literally works of Şikoyê Hesen. The first literally work is “Tembûra Kurda” and the other one is “Payîz û Ba”. The aim of this study is analyzing and commenting of Şikoyê Hesen’s literally works in the frame of perception and awareness of the language.

Keywords: Şikoyê Hesen, poem, patriotic rhetoric, linguistic perception.

* Xwendekarê doktorayê. Zanîngeha Bîngolê Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, ehmedseyari@gmail.com, ORCID: 0000-0001-2345-6789

1. Destpêk

Piştî Şoreşa Oktobirê ya 1917an li welatê Kafkasyayê pergala Sovyetê ya sosyalist hat avakirin (Ekinci, 2017:265). Di bin sîwana vê pergale de wekî wan nijadên din kurdên Kafkasyayê jî ji bo hin xebatên çandî û edebî derfetin bi dest xistin. (Boyîk, 2012:9). Di vê serdemê de di warê folklor, roman, helbest, şano, weşangerî û sînemayê de gelek xebatên kurdî hatin kirin. Yek ji van kesên ku di vê qonaxê de bi helbestên xwe derketiye pêş Şikoyê Hesene. Şiko di sala 1928an li gundê Camûşvana Biçûk, nehyeya Axbarabê (Komara Ermenistanê) jî dayik bûye (Boyîk, 2012:215). Malbata Şiko, piştî Cenga Cîhanê ji gundê Şatiroxliya navçeya Dîgorê, devera Qersê koçî Ermenistanê kiriye. Navê Bavê wî Hesên Mido ye. Şiko dema pênc salî bûye, bavê wî miriye. Piştî mirina bavê wî apê wî ew xwedî kiriye û daye xwendin (Reşîd, 2008: 10). “Şiko piştî xwendina destpêkê û navîn di sala 1948an de dikeve Zanîngeha Yêrîvanê Peymangeha Rojhilatzanîyê beşa zanist û ziman. Bi awayekî serkeftî û dereceyeke mezin ve di 1953an de destûrariyê digire” (Akboğa, 2014: 90). “Şikoyê Hesene, piştî ku zanîngehê tamam dike, di navbera salên 1954 û 1957an de mamostetiya zimanê ermenîkî dike. Dûre di beşa kurdî ya Radyoya Yêrîvanê de dest bi edîtorîyê dike û di navbera salên 1959 û 1961ê de jî şewirmendî û wergêriyê dike. Di sala 1961an de bi mebesta xwendina perwerdehiya bala diçe Leningradê û li ser zimannasiyê doktorayê dike. Di sala 1965an de li Înstîtuya Gelên Asya û Afrîka, Beşa kurdolojiyê tamam dike” (Dodkî, 2016: 16). Pêşî, şîrên Şiko di rojnameya Zanîngehê de tî belavkirin. Dûre bêtirî şîrên wî li rûpelên rojnameya ‘Riya Teze’ û bi beşa kurdî ya radyoya Êrîvanê tî belavkirin (Reşîd, 2008: 10). Di serê salên 1960î de bi saya helbestên Fêrikê Êsiv û Şikoyê Hesene edebiyata kurdî ya Ermenistanê hate asteke serdest (Reşîd, 2012:209). Yanî bi saya van helbestvanan digel Şehîdê Îbo û Simoyê Şemo wêjeya kurdî li Yekîtiya Sovyetê nûjen dibe ji bin tesîra wêjeyên rûsî û ermenî derdikeve. Van kesan mijarên nû anîne nav wêjeya kurdî, wêjeya kurdî gihandine rojên hemdem (Reşîd, 2008: 10). “Hêja Şikoyê Hesene li jîyanê bû sê heb pirtûkên wî yê helbestan hatin çapkirin. Di sala 1961ê de “Qalçîçek” di sala 1965an de “Tembûra Kurda” û di sala 1970yî de “Meremê Dilê Kurd” hatin çapkirin. Şiko di sala 1976an de dawî li jîyana xwe anî. Piştî mirina wî pirtûkeke wî ya bi navê “Perwaza Welat” hat weşandin (Reşîd, 2008: 10) û di sala 2008an de jî pirtûkeke ku ji helbestên wî yê bijartî pêk tê bi navê “Payîz û Ba” bi edîtorîya Tosinê Reşîd hat çapkirin.

2. Vegêrana Welatperwerîyê di Helbesta Şikoyê Hesene de

Carinan di helbestan de çîrokbêjîyek an jî parçeyek ji çîrokekê derdikeve pêş ku di xwe de hemanên wek dem, şexs û cih dihevine. Ji van helbestên ku di wan de lêker pir tî bikaranîn re helbestên vegêrî tî gotin. (Sümer, 2010: 28). Ji ber vê taybetîya xwe gelek caran ev helbest hinekî ji forma helbestê dîr dikevin. Ev taybetî di helbesta Şikoyê Hesene de pir heye. Şiko di vegêranên xwe de ji lîrîzmê û forma helbestê hewqas dîr nabe, lê di gelek helbestên wî de bi bikaranîna cih û leheng û bûyerekê, vegêranek pêk tê. Di helbesta Şikoyê Hesene de vegêrana welat û welatperwerîya di vê çarçoveyê de pir derdikeve pêş. Bi gelemperî jî welat di helbestên wî de wekî semboleke şênber a neteweperwerîyê xwe nîşan dide. "Di nav dahênanên nerîtên neteweyî de cihekî diyar ê dîmena sembolîk ê welat heye. Ji ber vê jî welat di gotara neteweyî de wek cihekî, helbestî tî şayesandin" (Ergün, 2017:133). Şiko ev nêrînen xwe, ev hestên xwe gelek caran bi rêya vegêranê û bi rêya vegêrekî tî ziman. Jixwe di metnên edebî de “rola vegêr

ew e ku gotara vegêranê pêk bîne. Ev tişt belkî di asta jîyanê de ne tişteke e, lê di ya vegêranê de gelek tişt e. Ji ber ku vegêr navbeynkarekî aktif e” (Alan, 2015:118).

Di vê helbesta jêrîn de Şikoyê Hesên di xeyala xwe de çîrokek saz kiriye û xwe li ser erşê zemîn xeyal kiriye. Li wir vegêr bi Ehmedê Xanî re ketiye diyalogê. Helbestvan di vê vegêranê de girîngîya welat û welatperwerîya xwe bi devê Ehmedê Xanî anîye ziman. Xanî axîn û keserê dikişînê û girîngîya welat bi pirsê xwe tîne ziman. Her wiha di vê vegêranê de Xanî şaş û metel dimîne ku kurd hêja bê Kurdistan dijîn. Şiko di vê pirsê ku bi berdevkîya Xanî tîne ziman hişmendîya xwe ya welatperwerîyê nîşan dide û heyfa xwe tîne û dibêje: Çawa kurdan heta neha Kurdistan ava nekiriye? Ehmedê Xanî, di edebîyata kurdî de bi gelek aliyên xwe wekî pêşengekî derdekeve pêş. Bi taybet ew fikr û ramanên wî yê ku di dibaceya Mem û Zînê de anîne ziman û di warê hizra neteweperwerîyê de ji bo gelek helbestvanan bûye bingeh. Alan, balê dikişîne ser vê taybetîyê ku kesên wekî Hecî Qadir, Celadet, Nûredîn Zaza, Cemal Nebez, Ferhad Shakely, Mûrad Ciwan, H. Mem, Faik Bulut, Medenî Ayhan, Amir Hassanpour, Îzeddîn Mustefa Resûl Xanî wekî pêşengê neteweperwerîya kurdî dibînin (Alan, 2013:23).

Ez carekê ser Pêxasê heylo çûme erşê ezmin,

Ahmed Xanî rûniştîbû ser Parnasê meyi hêşîn,

Saz-tembûrê xwe nihêrî, keser hatê, kire axîn

Go, bêje min, bêy Kurdistan kurd dinêda hela dijîn? (Hesên, 1965: 84).

Di helbesteke din de Şikoyê Hesên Kurdistan şibandîye zerîyekê. Dilbereke nazik û bedew ku xewê lê diherimîne. Heta sedemê jîyana wî bixwe jî ew e. Li dinyayê jî tiştê ku herî zêde jê hez dike ew e. Çawa yar û evîndara mirovan xewê li mirov diherimînin, welatê helbestvan ango Kurdistan wekî dilbereke xewa şevê li helbestvan herimandiye. Herwiha tiştê ku wî bi jîyanê ve girê dide û jê re dibê sebr û çare, dîsa welatê wî ye. Ji ber ku hemû merem û mirazê helbestvan welatê wî ye; kilamên wî, saza wî jî bo welat e.

Ji min pirsîn: “ Çi hizdikî

Li vê دنیا kaw, nazikî? “

Min go: “Zerîa naz û bedew,

Ku birandye min xewa şev,

Ku bêy wêya tune emir,

Ewe min ra çar û sebir,

Bêy wê tune kilam û saz,

Bêy wê tune merem, miraz...

Kaw, zerya min Kurdistane (Hesên, 2008: 35).

Di dewama helbestê de Şiko vê evîna xwe bi awayekî temsîlî tîne ziman. Lewra di vir de helbestvan xwe wek Sîyabend û Mem, welat jî wekî Xecê û Zînê dibîne. Di van rêzikan de ji bo Kurdistan hebûna xwe bidomîne û azad bibe û her wiha miradê gelek mirovan pêk bê helbestvan amade ye ku canê xwe feda bike û emrê xwe di ber welat de bide.

Dilî bi wê baristan e...

Ezim Sîabend, Memê evîn,

Kaw Kurdistan Xecê û Zîn.

Ezê bidmê emrê xwe jî,

Ku Kurdistan tenê bijî,

Tenê bijî, bibe aza,

Bibe kana bext, miraza... (Hesen, 1965: 20).

Di van rêzikên jêrîn de helbestvan bûyereke ku bi awayê hevpeyvînekê di navbera Gulnaz û Keleş de derbas dibe bi vegêraneke hostane di nav helbesta xwe de hûnandiyê. Gulnaz, dotmama Keleş e û Keleş di ber welatê we de hatiye kuştin. Helbestvan mirina di ber welat de wekî mirina di ber namûsê de terîf dike û kesên ji bo welatê xwe têkoşînê nekin wekî nebaş û kotî bi nav dike.

Ku caba şerê Wetenîyê derket,

Domamê xort kir temî û şîret:

Gava ku derî te bigre dijmin,

Yan dijmin bikujî yan were kuştin.

Boy namûsa xwe dimre mêrê çê,

Lê mêrê kotî-miriye rû dinê. (Hesen, 2008: 17)

Di dewama helbestê de em fêhm dikin ku ji bo mêranîya Keleş ku ji bo welat kiriye, peykerê wî hatiye çêkirin û li serê bi herfên zêrîn pesnê wî wiha hatiye dayîn:

Bona efatî, mêranîya keleş

Wetenê ezîz hêkel kire rewş.

Ser hêkelê wî bi herfê zêrîn

Ji navê weten aha nivîsîn: ...”

Keleş mêrxas, ewladê kurda,

Boy weten şer kir û serê xwe da (Hesen, 2008: 22).

Di helbesteke xwe ya din de Şikoyê Hesên rewşa welat teswîr dike û dîmeneke Kurdistanê tîne ber çavên me. Lê dîmeneke şer... Belê, şer û pevçûn e û Kurdistan dişewite. Her der mij û moran e, lê ne mijeke siruştî, toz û dûmana barûdê ye. Girî û nalîna zarokan, nalîna qîz û dayikan her der dorpêç kiriye. Di vê vegêranê de helbestvan bûyereke ku li Kurdistanê qewimîye li ber çavên me zindî dike û bi vî alîyê xwe çîroksazîyek derdikeve pêş. Belê, helbest behsa şerekî ku li Kurdistanê qewimîye dike. Lê hêmana şer ku alîyekî vegêranê saz dike derneketiye pêş û ji ber vê yekê vegêran hinekî qels maye.

Şer e şer e, le lê can,

Dişewite Kurdistan

Ji nav mija barûtê

Dengê şîn û girî tê...

Nalîna kalî tifala

Tê ji çiya û newala...

Qûjîna qîz, dayîka

Ketiye mêşê wawika (Hesen, 2008: 78).

Di van rêzikên jorîn de Şikoyê Hesên rewşa welatê xwe bi devê dayikeke ku zaroka xwe radizînê û li serê dilorînê ji me re vedibêje. Dayik dilbikul e. Welatê wê di nav mij û dûman û şer de ye. Ev welatê ku behsa wî dike Kurdistan e û di nav xwînê de sor bûye. Lê dîsa hêviya dayikê heye lewra ji zaroka xwe re dibêje:

Lûrî Lûrî, dayika te dest dergûş e,

Lûrî Lûrî, dilê wê kul, xuşûş e...

....

Lûrî Lûrî li me bûye mij, dûman,

Lûrî Lûrî, xûne sor kir Kurdistan (Hesen, 2008: 79).

Di helbestê de tê diyarkirin ku heta welat azad nebe zarokên wî welatî nikarin bi awayekî serbest û rehet bîna xwe bistînin. Di gel vê rewşa nexweş û dimêna dilsoz hêviyek bi vê dayikê re heye ku rojekê Kurdistan ava bibe. Şiko vê rewşê wiha tîne ziman:

Vê xewnê de ez çûme Kurdistana nuhî bikir,

Heçar qulba vêketna şemdanê bext û agir...

Vê xewnê de Kurdistanê ne mij hey, ne dûman,

Vê xewnê da çawa mizgîn birq vedidin erd, ezman,

Vê xewnê da eşq mizgîn e... Kurdistan wê aza biye...

...

Xêr û şayî Kurdistanê bûne rihêl û libas...

Û ez kubar mêze dikim Kurdistanê hezar car,

Kunde dibim û radmûsim xwelîya wê ya zîyaret, nar (Hesen, 2008: 84-88).

Helbestvan vê carê di xewna xwe de çîrokek li ser welatê xwe saz kiriye. Heta niha behsa Kurdistaneke di nav mij û dûmanê de û di nav şer de dikir. Lê êdî di vir de ji realîteyê hinekî dûr ketiye û di xewn û xeyalan de Kurdistaneke azad û xemilî dibîne. Ev vegêran, çîrokeke Osman Sebrî a bi navê *Li Goristanek Amedê* tîne bîra mirov, di vê çîrokê de jî serleheng ji welatê xwe dûr e û di xewn û xeyalên xwe de wek teyrekî difire û diçe welatê xwe û digel gelek lehengên dîrokî dikeve nav kar û xebatan (Sebrî, 1998:441). Di vir de jî Şikoyê Hesen tiştên ku dixwaze pêk bînin di hiş û xeyalên xwe de hûnandine û bi awayê vegêranekê nivîsandine.

3. Fêhma Ziman Di Helbestên Şikoyê Hesen de

Ziman, di avakirina hizra welatperwerîyê de cihekî girîng digire. Lewra gelek caran sînoren welatan jî li gor axêverên ziman diyar dibe û bi vî awayî ziman dibe diyardeyeke herî girîng a ku neteweyekê ji yê din cuda dike. “Ji sedsala 18an an ku ji peydabûna nasnameya neteweyî û pê ve, ji nava hêmanên ku neteweyekê pêk tînin, ziman wek girîngtirîn hêman hatiye hesabandin (Onen, 2018:29). Di helbesta Şikoyê Hesen de ev fêhm û hişmendîya ziman pir derketiye pêş û di radeyeke bilind de ye. Şiko, ev fêhm û nêrîna xwe di helbesteke xwe de wiha anîye ziman:

Ji min pirsîn: “Çi hizdikî”

Li vê dinya kaw, nazikî? “

Mi go “Zarê me yî kurdî,

Ku mîletê pirtî-pirtî

Dicivîne û dike yek

Çiqas pirbin qezya û şek,

Çiqas bibe ceng û teristan,

Ewe şemsê Kurd, Kurdistan

Herkê vese şemsê nedîr,

Bira pêşîê bidim texdîr (Hesen, 1965: 20).

Belê, Şiko di vir de roleke pir girîng daye ziman. Wî daye zanîn ku çiqas alozî, dubendî û pirsgirêk di nav kurdan de hebin û çiqas bi rewşên nexweş re rû bi rû bimînîn jî ziman dikare wan bîne cem hev û wan bike yek. Helbestvan, ji bo vê rewşê baş îfade bike ziman şibandiyê sîwanekê ku bikaribe di bin xwe de bihewîne.

Di helbesteke xwe ya din de Şiko kêfxweşîya xwe ji bo çapkirina Mem û Zîna Ehmedê Xanî û her wiha qedirbilindbûna wê anîye ziman. Berhemên ku bi zimanê kurdî hatine nivîsîn şibandine kevirên giranbiha. Ev hestên Şiko yên derbarê Mem û Zîna Ehmedê Xanî de hişmendîya wî ya derbarê zimanê kurdî de nîşan dide. Em ji van rêzikên wî fêhm dikin ku ew bi berhemên zimanê kurdî serbilind e û wan di asta yên wan wêjevanên din ên wekî Fîrdewsî de dibîne.

Tê vekirye Ahmedê me dil û dîwan,

Te hildaye mij-dûmana serê Sîpan,

Tê ser <Mem-Zîn> da alîkî xubar û sî,

Ahmed hatye û sekinye rex fîrdûsî,

Zanîna xwe te bona kurd kirye şamdan

Ji xizra kurd tu derdixî lala û mircan (Hesen, 1965: 35).

Di vê helbesta jêrîn de Şiko balê dikişîne ser Şoreşa Cotmehê ya ku li Sovyetê pêk hatiye û pesnê wê dide. Ji ber ku bi saya wê zar û ziman bi dest xistiye wê ji şîrê dêya xwe şîrîntir dibîne. Bêguman di pêşketina çand û zimanê kurdên Kafkasyayê de rola vê şoreşê heye. Lewra “piştî Şoreşa Oktobirê di sala 1923yan de li vî welatî gelek xwendîgehên kurdî vebûn. Her wiha bi rêya rojname, pirtûk û şanoyan zimanê kurdî bi pêş ket” (Hassanpour, 1997: 243).

Bi zarê kurdayî pir zengîn

Bihûnin kilamêd hewasî

Ji ruhê dewrêyî kûr, eynsî.

Kîjanî pê dijî ev weten

Bextewar û aza û bi ken (Hesen, 2008: 55).

Di vir de Şikoyê Hesen pesnê zimanê kurdî daye û dewlemendîya wî anîye ziman. Wî xwestiye ku bi vî zimanê dewlemend kilamên lehengî û qehremanîyê bîn hûnandin.

Di nav helbestên wî de ya ku di warê hişmendîya ziman de her zêde derdikeve pêş helbesta wî ya bi navê “Zimanê Kurdî” ye. Ev helbest wekî stran jî hatiye bestekirin û di nav gel de pir berbelav bûye. Şiko, fikr û ramanên xwe û hestên xwe yê derbarê zimanê kurdî de bi awayekî berfireh di vê helbestê de anîne ziman. Hest û nêrînên helbestvan ên derbarê ziman de di helbestê de gihanê lutkeyê. Ev helbest ji heşt beşan pêk tê û di her beşê de dîsgotina “zimanê kurdî” heye. Wekî din jî di her beşê de başî û dewlemendîyên zimanê kurdî yên cuda anîne ziman. Helbestvan taybetîyên zimanê kurdî yên wekî sêhr û efsûnîbûn, şîrînî û xweşbûn, letîfî

yanî xweşikbûn anîye ziman. Wekî din jî bi rêya şibandinê girîngîya ziman vegotiye. Ji xeynî xweşikahî û dewlemendîya ziman, Şiko di vê helbestê de behsa rola ziman a parastinê jî dike û dibêje:

*Bi sêr û sur e
Cewahir, dur e
Zimanê kurdî...*

*Bi xemil, rewş e,
Şîrin û xweş e,
Zimanê kurdî...*

*Bi nexş-awaz e,
Letîf û naz e,
Zimanê kurdî...*

*Gewgewê çiyar e,
Kubra Teyran e
Zimanê kurdî...*

*Xezel, helbest e,
Şemdan dest e,
Zimanê kurdî...*

*Beyta Feqî ye,
Sewta Xanî ye,
Zimanê kurdî (Hesen, 2008: 67).*

Di van rêzikan de tê destnîşankirin ku çawa mertal, laş û bedena mirov ji derbeyan diparêze her wiha wisa jî ziman wekî mertalekê çand û hebûna gel diparêze. Ev hestên Şiko yên ku di vê helbestê de derdikevin pêş, fêhm û hişmendîya wî ya zimanê kurdî nîşan didin.

*Şûrê Berzan e,
Nûra erşan e,
Zimanê kurdî...*

*Mertala me ye,
Dest pêşmerge ye
Zimanê kurdî (Hesen, 2008:67-68).*

ENCAM

Di helbestên Şikoyê Hesen de mijarên derbarê welatperwerîyê û ziman de bi awayekî şênber derdikevin pêş. Şiko, gelek helbestên xwe wekî çîrokekê hûnandine û hişmendîya xwe

ya di warê welatperwerî û ziman de di van helbestan de anîne ziman. Helbestên wî ji aliyê fêhma ziman ve jî dewlemend in. Şiko, di gelek helbestên xwe de dewlemendî û girîngîya zimanê kurdî derxistiye pêş. Di gelek cihan de Şiko ev hezkirin bi devê vegêranan û bi awayê çîroksazîyekê anîye ziman. Di van vegêranên Şiko yên li ser welat û welatperwerîyê de evîna wî ya welat û fedakarîya wî ya ji bo welatê wî tê dîtin. Herwiha wî rewşa welat a xerab şayesandiye û li ser vê rewşa welat xemgînîya xwe destnîşan kiriye. Dîsa di van helbestên wî de daxwaza fedakarîya ji bo azadîya welat derdikeve pêş. Di vegêranên Şiko yên ku hişmendîya wî ya di warê ziman de nîşan didin de jî roleke pir girîng ji bo ziman hatiye dayîn. Di van vegêranan de ziman wekî kilîda çareserîya pîrgirêkên kurdan, parastina wan û wekî dîyardeyeke sereke ku yekîtîyê di nav kurdan de pêk bîne, tê dîtin. Dîsa di helbestên Şiko de payebilindkirina zimanê kurdî û pesindana berhemên kurdî derdikeve pêş. Di nav van vegêranên wî de Ehmedê Xanî û berhema wî Mem û Zîn, pir tê bilêvkirin û di vê çarçoveyê de handanek ji bo nivîsîna berhemên kurdî derdikeve pêş.

ÇAVKANÎ

Akboğa, Hasan (2014). "Helbesta Zimanê Kurdî û Helbestvanekî wînda: Dr. Şikoyê Hesên.

Kovara Nûbiharê, 126, 89-91.

Hassanpour, Amir (1997). *Kürdistan'da Dil ve Milliyetçilik 1918-1985*. İstanbul: Avesta.

Hesên, Şikoyê (1971). *Meremê Dilê Kurd*. Nesîreta. Yerevan: Hayestan.

Hesên, Şikoyê (2008). *Payîz û Ba*. (Berv.Tosinê Reşîd). Stenbol: Avesta.

Hesên, Şikoyê (1965). *Tembûra Kurdan*. Êrîvan: Neşîrata Hayestan.

Sebrî, Osman (1998). *Li Gornistanek Amedê*. Hawar, 21, 2. (Amd. Hawar, c.1., Nûdem, Stockholm, , r.441.

Sümer, Mehmet (2010). *Turgut Uyar Şiirinde Anlatımcı*. Teza Lîsansa Bilind, İstanbul: Marmara Üniversitesi.

Alan, Remezan (2015). *Destpêk ji bo Zanista Edebîyata Modern*. Stenbol: Peywend.

Ergün, Zülküf (2017). *Nerît û Helbest Nerîta Neteweyî di helbesta Nû ya Kurdî de* (1880-1970). İstanbul: Nûbihar.

Boyîk, Eskerê (2012). *Çanda Kurdên Sovyetê*. Diyarbakır: Deng.

Ekinci, Yunus (2017). "Bolşevik İhtilâlinin Ortaya Çıkması Ve Sebepleri". Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi The Journal of International Social Sciences Cilt: 27, Sayı: 1, Sayfa: 265-275.

Onen, Ronayî (2018). *Ziman û Netewesazî*. (Wer.Şehmus Kurt). İstabul: Peywend.

Alan, Remezan (2013). *Bendname Li Ser Ruhê Edebiyatekê*. Stenbol: Peywend.

Dodkî, Tuwanê (2016.01.02). "Mîrê nenas ê Helbesta Kurdî Şikoyê Hesên". Basnews.

Malper: <http://www.basnews.com/index.php/kr/news/251361> (Pêgihîn: 20.10.2018).



Kovara Kurdirnameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdirname Dergisi
International Journal of Kurdirname

Uluslararası Kurdirname Dergisi
Sayı: 1 Kasım 2019



International Journal of Kurdirname
Issue: 1 November 2019

NÊRÎNÊN SEREKE ÊN WERGIRTINA ZIMÊN
MAJOR VIEWS OF THE LANGUAGE ACQUISITION
Esat ŞANLI*

Kurte

Armanca vê xebatê nixandina nêrînen sereke ên li ser wergirtina zimên e û di vê mijarê de, ku em di derbarê wê de kêmtir dizanin, ji xwendevanan re dayîna nêrîneke gelemperî ye. Qasî teoriyên di derbarê çêbûna zimên de di derbarê fêrbûna zimên û wergirtina wî de jî gelek teorî û rêbaz hatine pêşvebirin. Ji wan teoriyên sereke ên ku di vê xebatê de li ser wan hatiye seknandin ên Skinner, Piaget, Bruner û Chomsky nin. Em dikarin van teoriyan wekî teoriyên ku dibêjin melekeya wergirtinê pişt re tê girtin û ya Chomsky ku dibêje ji jidayikbûnê ve mirov xwediyê vê melekeyê ye dabeş bikin. Ji bo nixandina van teoriyan di xebata destê we de rêbaza deskriptîv hat tetbîqkirin. Derdikeve holê ku derbarê pêvajoya wergirtina zimên de hê zelalbûneke bi tevahî tune û zêdebûna teoriyên di derbarê wergirtina zimên de nîşan dide ku ev mijar dê di nîqaşên warê zimannasiyê de, dê di paşerojê de jî bibe yek ji mijarên navendî.

Peyvên kild: Kana Zimên, Wergirtina Zimên, Zimannasî, Teorîyên Wergirtina Zimên

Abstract

The aim of this study is to evaluate the main views on the language acquisition topic and present the readers an overall perspective on this process which we know a little about it. It can be seen that as much as the theories on the origin of language, there is a considerable amount of research on how the language is learnt and acquired. The main ones of these theories which have been discussed in this paper belong to Skinner, Piaget, Bruner and Chomsky. These views can be categorized as the view which claims that we acquire the language over the time, especially with the influence of outside on the one hand and that of Chomsky which claims that the language acquisition feature is coded in our brain, hence human has got it from the birth on the other hand. In this paper, to analyse these views the descriptive method has been applied. In conclusion, it's been observed that there is no a satisfactory result on the topic despite the studies on that topic and this subject is going to be one of the fundamental topics of the linguistics discussions in the future.

Key words: The Origin Of Language, Language Acquisition, Linguistics, Theories On The Language Acquisition

Destpêk

Xebatên di derbarê wergirtina zimên de di van salên dawî de gelekî zêde dibin (Pica, 2005: 1). Li gel vê jî em dikarin bêjin valahiyeke mezin di vê beşa zimannasiyê de di zimanê Kurdî de heye. Ewên ku di vê mijarê de hatine nivîsandin jî bi giranî li ser gelo zimanê dayîkê

* Xwendekarê Doktora Li Beşa Çand û Zimanê Kurdî ya Zanîngeha Dîcleyê, esatsanli84@gmail.com

an jî yê biyanî çawa tê wergirtinê disekinin ango li ser teoriyan wêdatir li ser metodên wergirtinê disekinin. Hindik be jî bi mebesta tijîkirina valahiya xebatên li ser vê mijarê yên zimannasiyê yên bi Kurdî; di vê xebata destê we de hewl tê dayîn ku bi awayekî gelemperî ji bo meraqdarên zimannasiyê û bi taybetî jî ji bo Kurdên ku di vê warê de xebatan dikin ramanê gelemperî ya li ser mijarê bê dayîn. Dibe ku ev xebat di nasandina teoriyên sereke yên vê mijarê de ji xebatên ku dê di vî warê de bêt amadekirin re perspektîfeke fireh bide qezenckirin.

Di vê xebata destê we de bi giranî rêbaza deskriptîv (agahîdar) hatiye tetbîqkirin. Lewra em dikarin bêjin ku ji nêrîn an jî analîzên şexsî yên nivîskar zêdetir giranî ji ravekirina agahiyên di derbarê teoriyên sereke re hatiye dayîn. Piştî dayîna fikrên sereke yên di derbarê mijarê de çî nêrînên nivîskar çî jî fikrên dijber an jî piştewanan hatine parvekirin. Her çend fikra ku xwe dispêre fêrbûna piştî jidayîkbûnê û mirov wekî hebûnek ku bi demê re hêdî-hêdî tiştan fêr dibe - lewra ziman jî tê de - hebe jî li hemberî vê fikrê fikra Chomsky ya beriya jidayîkbûnê hemû mirovên cihanê xwedî melekeyên xwezayî yên fêrbûna zimanan in û forma bingehe a zimên di mejiyê mirovan de ji xwe heye (Nath, 2010:4), wekî fikreke alternatîf der dikeve pêş. Lê dema em bala xwe didin di van salên dawî de li hemberî fikrên Chomsky ên di derbarê mijara wergirtina zimên de jî nerazîbûn hene. Ev rexne bi giranî li hemberî yek-alî nêrîna Chomsky tê. Lewra bi ramana xwe ya xwezayî Chomsky bandora derdorê hema-hema tune dihesibîne ku ev tunehesibandin jî bingeha rexneyên li hemberî teoriya wî ne. Di van salên dawî de wekî fikreke sêyem a alternatîf ku xwe zêdetir dispêre xebatên teknîkî di wê baweriyê de ye ku mirov hin taybetmendiyên wergirtina zimên ji jidayîkbûnê digire û yên din jî bi demê re fêr dibe. Di berawirdkirana van ramanên li ser wergirtina zimên de teoriya ku wekî alternatîfa sêyem derketiye pêş roj bi roj zêdetir di nav xebatkarên zimannasiyê de berbelav dibe.

Teoriyên Wergirtina Zimên

Wergirtina zimên (language acquisition) ku di van salên dawî de bûye qadeke berbiçav a xebatên zimannasiyê bi kurtasî wekî *pêvajoya ji aliyê zarok ve wergirtina zimanê dayikê* (Trask, 2007: 131) tê pênasekirin. Zimannasê îngilîz David Crystal di xebata xwe ya bi navê *An Encyclopedic Dictionary of Language and Languages* de çarçeveya pênaseya wergirtina zimên hinek jî firehtir dike û vê pêvajoyê bi du astan dinirxîne. Li gorî Crystal ev pêvajoyê hem pêvajoya destpêkê ya wergirtina zimên a zarokan di xwe de diheve û hem jî wekî referansekê duyemîn zimanê ku dê di pêvajoyên paşerojê de (zimanê duyemîn an jî zimanê biyanî) bihê fêrbûn di xwe de diheve (Crystal, 1992: 5). Îroj her çend xala navendî ya xebatên wergirtina zimên, pêvajoya wergirtina zimên a zarokan be jî di heman demê de di hejmara xebatên derbarê pêvajoya wergirtina zimanê duyemîn an jî zimanê biyanî de jî zêdebûneke berbiçav heye. Di vê mijarê de di serî de em dikarin Werner Leopold bi bîr bînin. Lewra xebata wî ya ji çar cildan a ku hê keça wî 8 hefteyî bûye û şûn de dengê wê not kirine, bitaybetî pêvajoya du salên ewil ê keça wî di xwe de diheve. Leopoldê ku cilda ewil a vê xebata wî ya ji çar cildan di sala 1939'an de hat weşandin, bi xebata xwe ya ku navê wê dibuhire ji bo zanîna wergirtina zimên û fêrbûna zimên detayên girîng pêşkêş dike (Fasold-Linton 2006: 206, 207).

Qasî pirsê gelo kana zimên çî ye, pirsên wekî ziman bi hawayekî nepenî di mejiyê mirovan de hatiye kodkirin an pişt re tê wergirtin, ger pişt re tê wergirtin ev bi çî hawayî pêk tê; hê jî çend pirsên nîqaşên zimannasiyê ne ku bersivên wan nehatine dayîn. Ger em bibêjin wergirtina zimên, bitaybetî jî piştê ku deng hatin qeydkirin û di warê norolînguîstîkê de pêşveçûn çêbûn ji asta mijareke talî ya zimannasiyê derket, bû yek ji mijarên bingehe ên

zimannasiyê dê ev nirxandineke şaş nebe. Ji hêla dinê ve belavbûna xebatên wergirtina zimên tenê bi şiyana qeydkirina dangan re sînordar nine. Lobên mejî yên ku di pêvajoya bikaranîna zimên û wergirtina wî de rol dilîzin êdî bi amûrên teknolojikî di taqîgehên de tîn çavdêrîkirin û analîzîkirin. Em dikarin bibêjin ev faktor jî dibin sebeb ku di derbarê pêvajoya wergirtina zimên de em bibin xwedî daneheviyeke biewletir.

Wekî berê jî hatibû ravekirin ku di derbarê wergirtina zimên de gelekî teorî hatine vegotin. Li şûna ku em li ser wan hemûyan yek bi yek bisekinin em dê di vê xebatê de teoriyên berbiçav binirxînin. Ji van teoriyan yek jê teoriya libatî (behaviourist theory) ya Burrhus Frederic Skinner e, yek jê teoriya binyadî (constructivist theory) ya Jean Piaget e, yek jê teoriya hevbandoriya civakî (social interactionism theory) ya Jerome Bruner e û herî dawî jî teoriya xwezayî (nativist theory) ya Noam Chomsky e.

Beriya ku em nêrîna libatî ya Skinner parve bikin divê em di derbarê têgiha „tabula rasa“ ku tê wateya *mejiyê pitikê yê ku hê tu bandorek li ser wî çê nebûye* de agahiyêke kurt pêşkêş bikin. Li gorî vê têgiha feylesof John Locke mejiyê mirovan di destpêkê de „tabula rasa“ ango „lehweyekî vala“ ye. Li gorî vê nêrînê tu ramanêke ku bi zayînê bi me re tê tune û em tiştên li derdorê li gorî tecrubeyên xwe yên ku em bi demê re tecrube dikin werdigirin. Lewra li gorî vê teoriya wergirtina zimên a ku ji ser vê ramanê şêkil girtiye ziman bi saya zexta derdorê û bi pihêtkirina erênî tê fêrbûn. Skinner di dema xebata xwe ya bi navê *Libata Devkî (Verbal Behavior)* de qût dide kevokekê, ji lebatên kevokê yê ku bi demê re wergirtiye bi rê dikeve û di navbera pêvajoya ewil a wergirtina zimên û tecrube ya lebatiyê de têkiliyêk datîne. Skinnerê ku di heman demê de îdîa dike ziman di encama pêvajoya berteka hişyarker a bixelat (stimulus-response-reward) de tê wergirtin, di pêvajoya wergirtina zimên de balê dikişîne li ser giringiya teqlîdê û dibêje ku di navbera tiştên ku li derdora me ne û libatên me yên devkiyan de têkiliyêk heye û ev têkilî xwe di pêvajoya wergirtina zimên de jî nîşan dide. Di heman demê de li gorî Skinner paraleliya devkî (verbal parallel) bi xwe olana ango dengvedana libatê ye. Lewra wergirtina resen a gencineya devkî, bi gotineke dinê wergirtina zimanekî nû, û olana libatê ya axîfêr di pêvajoyêke piştî libatan a guhdar de bicih tê. (Skinner, 1957: 29, 125, 381). Bikurtasî em dikarin bêjin ku li gorî vê nêrînê wergirtina zimên encameke pêvajoya teqlîda devkî ya libatên derdorê û bixelatkirina zarokan a ji bo vê teqlîdê ye.

Nêrîna duyemîn a ku di derbarê gelo mirov zimên çawa werdigirin de derdikeve pêş teoriya binyadî ya Piaget e. Ji bo Piaget fêrbûn pêvajoyêke têkildarê pêşveçûnê ye ku di nav vê pêvajoyê de guherîn, xwe-avakirin û sazîkirin hene ku her yek ji van xwe dispêrin fêrbûnên ku berê hatine tecrube kirin. (Tavakoli 2012: 84) Li gorî vê teoriyê wergirtina zimên li gorî rêbazên fêrbûnê yên pitikan pêşve dere. Dema ku Piaget pêvajoya wergirtina zimên îzeh dike di navbera *zimanê xwenavend* (ego-centric language) û *zimanê civakîbûyî* (socialized language) de cudabûneke diyar dike, vê pêvajoyê di bin sernavê her du qonaxên navderbasbûyî de dinirxîne. Ji van qonaxan di ya ewil de, ku navê vê qonaxê zimanê xwenavend e, axaftina zarok ji bo xwe ye (Piaget, 1926: 9, 10). Li gorî vê nêrînê emrê zarok çendî mezintir dibe, zarok ji dinêya ku berê xwe wekî navenda wê didîtin dûr dikeve û tev li dinêya civakî ya derdora xwe dibe û bi vê awayî zimanê wî/wê jî dibe zimanekî civakî.

Piagetê ku li hemberê teoriya libatî der dikeve, di vê ramanê de ye ku zarok di pêvajoya geşbûna wergirtinê de ji hin qonaxên ku her ku diçin kompleksbûna wan zêdetir dibe derbas dibin (Piaget, 1926: 53) û ew di heman demê de pêvajoya geşbûna wergirtinê ya zarokan di bin çar qonaxan de disenifîne. Di pêvajoya ewil a van qonaxan de, ku qonaxa seh-motor

(sensorimotor stage) e, pitik (navbera 0-2 salî) bi tecrubeyên xwe yê sehî yê ku bi rêya libatên xwe yê fîzîkiyan tecrube kirine dikin ku wateyêk bidin dinêya derdora xwe. Di qonaxa duyemîn de, ku qonaxa beriya fonksiyonê ye, zarok (navbera 2-7 salî) dinêya derdora xwe bi gotin û hêmayan tîne zimên. Di qonaxa sêyemîn a bi navê qonaxa fonksiyoneliyê ya şênber de zarok (navbera 7-11 salî) di navbera bûyerên şênber de mentiq bi rê ve dibe û di navbera bûyeran de pêwendî datîne. Zarok di vê qonaxê de êdî fêrê qaydeyan bûye. Di qonaxa dawî de, ku ev qonaxa wekî qonaxa fonksiyonê ya formel tê binavkirin, takekesê/a ku êdî gihiştîye balixiyê (11 salî û şûn de) di têgihiştina rewşan de digihîje asteke têr û di derbarê paşerojê de dest bi fikirîna dike. Bikurtasî em dikarin bêjin ku Piaget, axaftina zarokan wekî xwenavend û civakîbûyî di bin du beşan de disenifîne. Pêvajoyê, ji axaftina xwenavend ve ber bi axaftina civakîbûyî dere. Piştî ku axaftina xwenavend winda dibe û axaftina civakîbûyî şûna wê digire xwenavendbûnê ji holê radibe (Yücel, 2014: 1).

Di derbarê mijarê de teoriya sêyemîn a ku em dê li ser bisekinin ya Jerome Bruner e ku wekî teoriya hevbandoriya civakî (social interactionism theory) tê zanîn. Li gorî vê teoriyê hevbandoriyên ragihanî ji bo wergirtina zimên ferz in. Ev nêrîn xwe dispêre teoriya fêrbûna civakî ya Bruner. Li gorî teoriya navbihurî wergirtina zimên di encama hevbandoriyên jiyana rojaneyê de derdikeve holê û ev faktor di heman demê de rê ji pitikan re vedike ku bikaribin bikaranîna zimên pêşve bibin. Em dikarin bêjin ku ev teorî zêdetir hêla fonksiyonel a zimên derdixîne pêş. Ango li gorî vê ramanê pitik ji bo ku bikaribe bibe parçeyêkê civakê ziman fêr dibe. Zimannasê navdar Ferdinand de Saussure jî di xebata xwe ya bi navê Dersên Zimannasiya Gelemperî (*Course de Linguistique Générale*) de balê dikişîne li ser hêla civakîbûnê ya wergirtina zimên û dibêje “ziman di nav civakê de, di mejiyê her takekesê/a wê civakê de wekî hevgerîneke şopan dijî û ziman wekî ferhengê e ku hemû mînakên wê yê heman ango wekhev ji her takekesê/a civakê re hatiye parvekirin (Vardar, 1985: 22).

Wekî xuya dibe ev nêrîna Saussure pişt dide teoriya Bruner a wekî *ji bo pitik bibe parçeyêkê civakê zimên werdigire*. Lewra parnegirtina ji wan peyvên hemanan ihtîmaleke mezin ji bo pitikê de di nav civakê de, di paşerojê de dibe sedema hin pîrsgerîkan. Nexwe Bruner di berhema xwe ya bi navê Axaftina Zarok (*Child's Talk*) de tîne zimên ku piraniya pêvajoya wergirtinê ya pitikan ji bo bicihanîna pêwistiyên wan e û hê ji roja ewil ve pitik qaydeyên derdora xwe têdigihîje (Bruner, 1983: 24-25). Ji ber vê yekê em dikarin bêjin ku wekî teoriya Skinner li gorî teoriya hevbandoriya civakî jî di navbera wergirtina zimên, teqlîdkirina pitikan a derdora xwe û tîkiliyên civakî yê ku bi demê re komplîketir dibin de pêwendiyêke xurt heye. Di heman demê de Bruner di xebata xwe ya navderbasbûyî de balê dikişîne li ser sê pêwindiyên wergirtina zimên a zarokan. Ew van pêwindiyên jî wekî hevoksazî, semantîk û kirdarînasî (pragmatics) ya zimên binav dike. Li gorî wî ji ev her sê beşên zimên her yekê wan girêdayî hevdu ne, ji hev serbixwe ninin. (h.b. :18).

Di derbarê mijara wergirtina zimên de yek ji teoriyên girîng ên ku derdikeve pêş jî ya zimannasê navdar Noam Chomsky a bi navê teoriya xwezayî ye. Di bingeha vê teoriyê de teoriya gramera gerdûnî ya Chomsky heye (Trask, 2007: 312) ku li gorî vê teoriyê mirov di xala wergirtina zimên de ji jidayikbûnê ve xwedî hin melekeyên hevpar in. Bi vê nêrîna xwe Chomsky li hemberê nêrîna Skinner a ku dibêje wergirtina zimên ji derdorê çêdibe derdikeve. Li gorî teoriya xwezayiyê zarok zimanê ewil tenê bi guhdarîkirina mezinên xwe yê derdorê fêr nabe. Wergirtina zimên a esil a zarokan ji melekeya sazkirina hevokên gramatîk a ku bi hemû mirovan re heye tê. Li gorî Chomsky ji aliyê zarok ve di ewqas demeke kin de fêrbûna

zimên, ji bilî melekeya wergirtina zimên a ku ji jidayikbûnê ve tê, bi tu awayekî dinê nikare bihê îzehkirin. Nexwe li gorî wî mirov dikarin hevokên ku berê qe nebihîstine bi awayekî rêkûpêk tê bigîhin û saz bikin (Cook-Newson 1996: 77).

Bêguman wekî gelekî teoriyên navdar ên zimannasiyê li hemberî vê teoriyê jî rexne hatine kirin. Li gorî rexnegirên vê teoriyê her çend aşkere ye ku zarok tenê bi rêya teqlîdê nikarin zimên werbigirin jî ev rastî bi serê xwe têr nake ku mirov îdîa bike û bêje melekeyeke wan a xwezayî ya wergirtina zimên heye. Sedema ewil a rexnekirinê zimannasî yê li hemberî teoriya wergirtina zimên a Chomsky ew e ku teoriya wî hem hêlên civakkî û hem jî hêlên derûnî yê mirovan piştguh dike (Guðlaugsdóttir, 2016: 21). Chomsky li hemberî rexneyan teoriya xwe wiha diparêze "...Gelek mirov îdîaya ku dibêje ziman ji jidayikbûnê tê red dikin lê ew nikarin bersiv bidin vê îdîayê. Sedema ku ew nikarin bersivê bidin vê îdîayê ew e ku tu wateya tezê wan tune. Tu rêyek ku ew bersiv bidin van îdîayan tune. Eger hûn bêjin 'ziman tiştê ku ji jidayikbûnê tê nine' wê demê hûn tu cûdabûnê naxînin navbera neviyê min, kevirekî an jî kîvroşkekî." (Bayırlı, 2014: 59) Li gel vê parastina Chomsky jî ji xebatên ku li qada çapgeriya lîngûîstîkê (linguistic typology) tên kirin fêhm dibe ku teoriya Chomsky a gramera gerdûnî ji bo têgihîştineke gelemperî ya zimên têrê nake. Pirsgirêka vê teoriyê ya yekem ew e ku li ser hindik zimanan sekiniye û bitaybetî jî xwe dispêre tespîtên li ser zimanê Îngilîzî. Ya duyem xebatên di demê dawî de hatine kirin nîşan didin ku qasî ku di vê teoriyê de tê îdîakirin ziman ne xwedî qalibên hevpar in. Çendî li ser pir zimanan xebat tên kirin, ewqas der dikeve holê ku qalibên wan ji hev cûda ne. (Evans-Green 2006: 56) Li ser van argumanan em dikarin bêjin ku teoriya Chomsky jî ji bo îzehkirineke temam a wergirtinê têr nake.

Her çend xebatên wergirtina zimên a pitikan ên ku di salên dawî de hatine kirin nîşan didin ku pitik di cudakirina dangan de xwedî melekeyeke mezin in jî, wekî rexnegirên Chomsky jî dibêjin, hin melekeyên mirov ên têkildarî zimên ên ku ji dema jidayikbûnê ve tên têr nakin ku em bêjin ev meleke bi tevahî bi wergirtina zimên re têkildar in. Nexwe mirov nikare bêje faktorên derdorî yê ku pitik di dema mezinbûnê de rastê wan tên û wan tecrube dikin faktorên negirîng an jî diyarker ninin. Li gel ku zimannas Chomsky di xebata xwe ya bi navê *Ziman û Heş* (Language and Mind) de li hemberî rexneyên zimannas Hilary Putnam ên di derbarê teoriya wî de bersiv dide jî bi gotina "Ger di bingeha wergirtina zimên de gramereke gerdûnî heye, ev faktor problema wergirtinê qe nebe bi awayekî qismî çareser dike" (Chomsky, 2006: 164) qebûl dike ku di teoriya wî de hin beşên netemamkirî hene, ango pirsên ku nehatine bersivandin hene.

Encam

Wiha xuya ye ku her çend her çar teoriyên ku behsa wan hat kirin di encama hin ceribandin û lêkolînan de derkevin holê jî dawî li nîqaşa li ser mijara wergirtina zimên neanîne, lewra ev nîqaş hê jî berdewam dike. Di çarçeveyê firehtir a analîza her çar teoriyên sereke ên jorîn de em dikarin bêjin ku pêvajoya wergirtina zimên bi yek dema jiyana mirovan re sînorkirin an jî vê pêvajoyê sedî sed bi xwedîbûna melekeyên xwezayî yê wergirtinê ve girêdan îzaha vê pêvajoyê zehmettir dike. Divê ev pêvajo wekî pêvajoyeke yekpar na, lê wekî pêvajoyeke pîralî bê nirxandin. Li gel ku melekeyên me yê xwezayî yê fêrbûn an jî wergirtina zimên hebin jî ev meleke bi xwe têrê nake ku em vê pêvajoya dûr û dirêj ronî bikin.

Di nêrînên zanyar Skinner de li ser mijarê fikra ku der dikeve pêş ev e ku di wergirtina zimên de rola sereke teqlîdkirin dilîze. Mirov derdorê teqlîd dikin û bi vî awayî ziman wer digirin. Li şûna teqlîdê zanyar Piaget di pêvajoya wergirtina zimên a mirovan de rêbaza fêrbûnê

ya zarokan der dixîne pêş û îdîa dike ku zarok bi mezinbûnê re ji navendîtiyê xilas dibe û dibe beşeke civaka derdorê û pêvajoya wergirtinê ji ser vê ramanê îzeh dike. Li gel van teoriyan zanyar Bruner di pêvajoya wergirtinê de wekî faktora bingeyên ne teqlîdkirina Skinner û ne jî pêvajoyên xwenvendîtî û zimanê civakî ya Piaget bicih dike, li gel ku di rola civakbûna zimên de hin xalên hevbeş bi Piaget re parve bike jî, dibêje wergirtin bi saya civakbûna zarokan pêk tê, ango faktora civakbûnê dike bingeha wergirtina zimên. Li gorî Bruner dema mirov di jiyana xwe ya rojaneyê de didin û distînin, ev danûstendin bi xwe re têkilîyên ku wergirtina zimên ferz dikin tînin, ji ber vê yekê di bingeha wergirtina zimên de civakbûn heye. Wekî tê dîtin hin cûdahî di navbera van sê teoriyan de hebin jî hemû vê pêvajoyê wekî pêvajoyek ku bi demê re çê dibe dinirxînin. Ew wekî Chomsky îdîa nakin ku ji xwe melekeya wergirtinê di mejiyê mirovan de kodkirî ye û di pêvajoya wergirtinê de rola bingehîn ew faktor dilîze. Li hemberî fikra Chomsky ew dibêjin ku wergirtin pişt re ji sedemên cûda-cûda çê dibe. Ji aliyê dinê ve em dikarin bêjin hin xebatên ku rola melekeyên xwezayî nîşan didin, yê wekî nasîna dengên ên pitikan, ku hin taybetmendiyên bi çêbûna mirov re tînin jî hene û Chomsky ne xwedî argumanên lewaz e. Lê ev bihêzbûna argumana Chomsky nayê wê wateyê ku em bikaribin bêjin mirov bi melekeya wergirtinê ku di mejiyê wî/wê de hatiye kodkirin tê dinê.

Dema mirov li teoriyên jorîn ên di derbarê wergirtina zimên dinêre baştir dibîne ku ev mijar çiqas mijareke berfireh e. Carna ev teorî di asta tezatbûnê de xwedî nêrînên cuda ne, wekî teoriya libatî ya Skinner û teoriya xwezayî ya Chomsky. Ji çar teoriyên ku di xebatê de derbas bûn her sê yê pêşîn bi giranî wergirtina zimên bi faktorên derveyî ve girê didin; lê teoriya xwezayî ya Chomsky pêvajoya wergirtinê wekî pêvajoyek ku di mejiyê mirovan de kodkirî ye dinirxîne, ango bi faktorên hundirî ve girê dide. Bikurtasî em dikarin bêjin ku nîqaşa bingehîn a li ser mijara wergirtina zimên di navbera nêrîna ku dibêje em ji jidayikbûnê ve xwedî melekeya wergirtina zimên in û ya ku dibêje em bi demê re dibin xwediyê vê melekeyê de çêdibe. Dema em tevlîheviya mijarê bigirin ber nezer xuya ye ku dê di paşerojê de jî di navbera zimannasan de nîqaşên li ser wergirtina zimên berdewam bikin.

ÇAVKANÎ

- Bruner, J. (1983). *Child's Talk Learning to Use Language*. Oxford: Oxford University Press.
- Chomsky, N. (2006), *Language and Mind* (ç. 3.). Cambridge: Cambridge University Press.
- Chomsky, N. (2014), *Dilin Mimarisi*. (İ. K. Bayırlı, Wer.). İstanbul: Boğaziçi Üniversitesi Yayınevi.
- Connor-Linton, R. W. (Ed.). (2006). *An Introduction to Language and Linguistics*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Cook, V. J., Newson, Mark (1996). *Chomsky's Universal Grammar* (ç. 2.). Oxford: Blackwell.
- Crystal, D. (1992). *An Encyclopedic Dictionary of Language and Languages*. Oxford: Blackwell.
- Evans, V., Green, M. (2006). *Cognitive Linguistics An Introduction*. Edinburgh: Edinburgh University Press.
- Piaget, J. (1926). *The Language and Thought of the Child*. (M. Warden, Wer.) Londra: Edinburgh Press.
- Saussure, F. d. (1985). *Genel Dilbilim Dersleri*. (B. Vardar, Wer.) Ankara: Birey Toplum.

Skinner, B. F. (1957). *Verbal Behavior*. (R. M. Elliot, Ed.) New York: Appleton Century Crofts (ACC).

Tavakoli, Hossein. (2012). *A Dictionary of Language Acquisition*. Tehran: Rahnama Press.

Trask, R. L. (2007). *Language and Linguistics The Key Concepts*. (P. Stockwell, Ed.) New York: Routledge.

Çavkaniyên Dîjîtal

Guðlaugsdóttir, E. B. (2016). di dîroka 27, 09, 2019 de ji adresa <https://skemman.is/bitstream/1946/24426/1/Erla%20Bj%C3%B6rk%20Gu%C3%B0laugd%C3%B3ttir.pdf> hat girtin.

Nath, Baiju K. (2010). di dîroka 07, 11, 2019 de ji adresa <https://files.eric.ed.gov/fulltext/ED512896.pdf> hat girtin.

Pica, T. (2005, 01 01). *Second Language Acquisition Research and Applied Linguistics*. University of Pennsylvania. di dîroka 07, 11, 2019 de ji adresa http://repository.upenn.edu/cgi/viewcontent.cgi?article=1033&context=gse_pubs hat girtin.

Yücel, D. M. (2014). *Dil Gelişimi*. di dîroka 06, 09, 2019 de ji adresa <https://www.dmy.info/dil-gelisimi/> hat girtin.



Kovara KurdiNameyê ya Navnetewî
Uluslararası KurdiName Dergisi
International Journal of KurdiName

Uluslararası KurdiName Dergisi
Sayı: 1 Kasım 2019



International Journal of KurdiName
Issue: 1 November 2019

Nasandina Pirtûkan

Osman Aslanoğlu/Bedirhan İslamoğlu/Zeki Gürür/Hayrullah Acar/Evren Aslanoğlu.

Türkçe: Çok Dilli Sözlük- Kurdî/Kurmancî: Ferhenga Pirzimanî- Kurdî/Kirmanckî (Zazakî):
Ferhenga Zafziwan- Kurdî/Soranî: Ferhengî Fireziman- Fârisî: Ferhenga Çend Zebane فر هنگ
چند زبانه

Stenbol, Weşanên Nûbihar, 2011. 239 rr.,

ISBN 978-605-5402-20-4

Ahmed KAN¹

Ferhenga Pirzimanî her çi qas bi kurdîya kurmancî hetibe bi nav kirin jî dîsa wek pirtûk naverok, pêşgotin û destpêka wê bi tirkî ye. Ji çar beşan pêk hatiye. Pêşgotin, wiha dest pê dike: “Ev xebata ferhengî ya mutewazî ku di destê we da ye, bi hîlbijartina ji bêjeyên herî berbelav û pêwîst ên pratîk ku di jiyana rojane da tînan bikar anîn, hatiye amadekirin û bi zanîna gramatîka esasî ya ku dê cewaziyên di navbera zimanan da binimînin hatiye palpiştîkirin.”

Bi balkişandina girîngiya ziman pêşgotin didome. Ev xebat, bi armanca ku ji kesên bala wan li ser fêrbûna zimanan e, ra bo xebata ferhengên pirzimanî li ser berawirdkirina zimanên hînd-ewropî yê wek îngilîzî, farîsî û bi taybetî jî bi sê zaravayên kurdî (kurmancî, kirmanckî û soranî) ra bibe peyam û modelek, hatiye kirin. (r. 7)

Di pêşgotinê da tê ziman ku ew (amadekarên ferhengê) bi feraseta xebatên wiha pirzimanî bo kesek dê zehmet be tevgeriyane û bi awayek hevpar amadekirine. Ev xebat ji bo berawirdkirina sê zaravayên kurdî jî derfetek baş e.

Me li jorê nivîsî ku ev xebat ji çar beşan pêk hatiye. Niha jî em ê beş bi beş ferhenga pirzimanî binirxînin:

Beşa yekê, ji 39 mijaran pêk hatiye. Her mijar jî ji bêjeyên bingehîn ên ku rojane meriv pê ra rû bi rû dimîne pêk hatiye. Ji xeynê pênc mijaran (navê jimar, jimarên rêzê, roj, heyv û demsalan), ev beş li gorî zimanê tirkî mijar bi mijar wek alfabetîk hatiye rêzîkirin. Kesek ku bixwaze dikare bijeyên esasî yê mijara ku bala wî/wê dikişîne li ser hev bi zimanên din ra

*Xwendekarê taybet ê doktoraya kurdî, Zanîngeha Dicleyê

berawird bike. Ev beş nêzîkê 1450 bêjeyên tirkî di nava xwe da dihewîne. Lê di zimanên din ên wek farisî û zaravayên kurdî da, meriv kare bibêje ku ji her yek bêjeyek tirkî ra gelek bêjeyên sînonîm (hemwate) hatine dayîn. Ev jî dewlemendiya kurdî û farisî nîşan dide. Ji van mijaran mijara herî berfireh ya lêkeran e ku ji 268 lêkerên bingehîn ên di jiyana rojane da herî zêde tên bikar anîn, pêk hatiye. Di vê beşê da mijara ku li gorî jimara peyvên li dû lêkeran bi hijmarek zêde peyvên hatiye pêşkêş kirin, mijara rengdêran (hevalnavan) e. Ferhenga Pirzimanî wek tabloyên ku ji şeş sitûnan pêk tînin hatiye amadekirin. Ebadên şêklî yê ferhengê, ji 167x235 mm. pêk hatiye, ev ebadê rûpelan ji bo teblayên şeş sitûnî gelek bikêrhatî ye. Bi teblayan pêşkêş kirina vê ferhengê ji bo kesên lêkolîner bûye derfetek sûdewer. Meriv dikare bibêje ji bo ku bi vî şêklî ferheng bê amade kirin gelek şewir li serê hatiye kirin. Amadekarên vê ferhenga pirzimanî bi kedek giranbiha ev berhem amade kirine. Wek nimûneya tabloyan me xwest em di nivîsa xwe da tabloya jêrîn bi cih bikin:

Türkçe		Sayılar			
Kurmancî		Jimar, Hejmar			
Kirmanckî (Zazakî)		Hûmarrî			
Sorani		Jimar			
Fârisî		شماره‌ها Şomârehâ			
English		Numbers			
Türkçe	Kurmancî	Kirmanckî	Sorani	Fârisî	English
Sıfır	Sifir, nîn	Sifir	Sifir, niye	صفر sefr	Zero
Bir	Yek	Yew	Yek	يك Yek	One
İki	Du, Didu	Di	Du	دو Do	Two
Üç	Sê, Sisê	Hîrê	Sê	سه Se	Three
Dört	Çar	Çar	Çiwar	چهار Çehâr	Four
Beş	Pênc	Panc	Pênc	پنج Penc	Five
Altı	Şeş	Şeş	Şeş	شش Şeş	Six
Yedi	Heft	Hewt	Heft	هفت Heft	Seven
Sekiz	Heşt	Heşt	Heşt	هشت Heşt	Eight
Dokuz	Neh	New	Nohem	نه Noh	Nine
On	Deh	Des	Deh	ده Deh	Ten
On bir	Yazdeh, Deh û yek	Yewendes	Yazde	یازده Yazdeh	Eleven
On iki	Dozdeh, Deh û du	Diwês	Duwazde	دوازده Devâzdeh	Twelve
On üç	Sêzdeh, Deh û sê	Hîrês	Siyazde	سیزده Sîzdeh	Thirteen
On dört	Çardeh, Deh û çar	Çarês	Çwarde	چهارده Çehârdeh	Fourteen
On beş	Pazdeh, Deh û pênc	Pancês	Pazde	پانزده Pânzdeh	Fifteen
On altı	Şazdeh, Deh û şeş	Şiyês	Şazde	شانزده Şanzdeh	Sixteen
On yedi	Hevdeh, Deh û heft	Hewtês	Hevde	هفده Hefdeh	Seventeen
On sekiz	Hijdeh, Deh û heşt	Heştês	Hejde	هجده Hecdeh	Eighteen
On dokuz	Nozdeh, Deh û neh	Newês	Nozde	نوزده Nûzdeh	Nineteen
Yirmi	Bîst	Vîst	Bîst	بیست Bîst	Twenty
Otuz	Sî, Sih	Hîris	Sî	سی Sî	Thirty
Kırk	Çel, Çil	Çewres	Çel	چهل Çehel	Forty

Elli	Pencî	Pancas	Penca	پنجاه Pencah	Fifty
Altmış	Şêst	Şeştî	Şest	شصت Şest	Sixty

Beşa Diduyan: Hemû bêjeyên ku di beşa yekê da, mijar bi mijar li gorî zimanê tirkî hatibûn rêzkirin, di vê beşê da li gorî alfabeya kurdî, peyv bi peyv li pey hev hatine rêzkirin. Dema meriv bixwaze kurdiya kurmancî bi zimanên din ra berawird bike, ev beş dê karê meriv hêsan bike. Di beşa yekê da wek me li jorê di teblayê da nîşan da, peyvên tirkî ji sitûna yekê çûn sitûna dawî û sitûna kurmancî bû yekem sitûn. Ji ber ku êdî pêdivî bi navê mijaran (şêş rêzên her yek ji navê 39 mijran) nema, bi kêmanî deh rûpelên beşa duyem kêman bûn. Ev beş ji bo kesên ku kurdî bi zimanên din (Fârisî, Îngilîzî û Tirkî) û kurmancî bi zaravayên din (Kirmanckî/Sorani) ên kurdî ra muqayese (berawird) bikin derfetek baş dide. Jixwe wek pirtûk Ferhenga Pirzimanî ji xeynê vê beşê bi tevayî li gorî alfabeya tirkî hatiye rêzkirin, ev jî hêsanîyek dide xwendekarên li Tirkiyeyê. Lewra her kes bi zimanê tirkî perwerdehî dîtiye.

Beşa Sisêyan: Ev beş jî wek beşa duyem, peyv bi peyv ji 1450 bêjeyên beşa yekê ku di 39 mijaran da hatibûn pêşkêş kirin pêk hatiye. Cudahiya di navbera vê beşê û beşa duyem da ew e ku rêzkirina beşa duyem li gorî alfabeya kurdî ye û ya sêyem jî li gorî alfabeya tirkî ye. Cihgirtina van du zimanan di sitûna yekem da diguhere.

Beşa Çaran: Ev beş, ji peyv û hevokên bingehîn ên giramatîka zimanên ku di Ferhenga Pirzimanî da cihgirtine, pêk hatiye. Bi saya vê beşê meriv kare agahiyên girîng derbarê rêbazên rêzimana wan zimanan da bi awayek piraktîk, wek cihgirtina ravek û hevokan di tabloyan da, bigire. Bi piranî jî ravek û hevokên ku xalên cêwaz an hevpar ên van zimanan dinimînî hatine hilbijartin. Em dikarin van taybetiyan di pênc tabloyên jêrîn ên rêzimanî da bibînin:

Türkçe	Mavi göz	Mavi gözler	Küçük göz	Küçük göz
Kurmancî	Çavê şîn	Çavên şîn	Çavê biçûk	Çavên Biçûk
Zazakî	Çimo zeng	Çimo zengî	Çimo qij	Çimo qijî
Sorani	Çawî şîn	Çawî şîn	Çawî biçûk	Çawî biçûk
Fârisî	چشم ابی Çeşmê Âbî	چشمهای ابی Çeşmhayê âbî	چشم ریز Çeşmê rîz	چشمهای ریز Çeşmhayê rîz
English	Blue eye	Blue eyes	Small eye	Small eyes

Türkçe	Oğul	Oğullar	Oğlum	Oğullarım
Kurmancî	Lawik	Lawik	Lawikê min	Lawikên min
Zazakî	Laj	Lajî	Lajê mi	Lajî mi
Sorani	Kur	Kurekan	Kurî min	Kurekanî min
Fârisî	پسر Peser	پسرها Peserha	پسر من Peserê men	پسرهایم Peserhâyem
English	Son	Sons	My son	My sons

Türkçe	Kız (Evlat)	Kızlar (Evlat)	Kızım	Kızlarım
Kurmancî	Keçik	Keçik	Keçika min	Keçikên min
Zazakî	Kêna	Kênekî	Kêna mi	Kêneyê mi
Sorani	Kiç	Kiçekan	Kiçî xom	Kiçekanî xom
Fârisî	دختر Doxter	دخترها Doxterha	دخترم Doxterem	دخترهای من Doxterhayê men
English	Daughter	Daughters	My daughter	My daughters

Türkçe	Kız	Kızdan	Kızlar	Kızlardan
Kurmancî	Keçik	Ji keçikê	Keçik	Ji keçikan

Zazakî	Kêyneke	Kêyneke ra	Kêynekî	Kêyekan ra
Soranî	Kiç	Le kiç	Kiçan	Le kiçan
Fârisî	دختر Doxter	از دختر Ez doxter	دختران Doxterân	از دختران Ez doxterân
English	Girl	From girl	Girls	From girls

Türkçe	Oğlan	Oğlandan	Oğlanlar	Oğlanlardan
Kurmancî	Lawik	Ji lawikî/lêwik	Lawik	Ji lawikan
Zazakî	Lajek	Lajekî ra	Lajekî	Lajekan ra
Soranî	Kur	Le kur	Kuran	Le kuran
Fârisî	پسر Peser	از پسر Ez peser	پسران Peserân	از پسران Ez peserân
English	Boy	From boy	Boys	From boys

Bi awayek giştî meriv kare bibêje ku ev berhema hevpar bi keda giranbiha ya gelek zimanzanan hatiye amadekirin. Lê dîsa jî ji hêla teknîkî ve hinek kêmanî di redeksiyonê da xuya dikin. Di tabloya beşa yekem a ku me li jorê jî nîşan daye da, “pêncî”ya sitûna kurmancî wek “pencî” ye (r. 13). Di sitûnên kurmancî û soranî da li cihê dewletê, welat hatiye nivîsîn (r.29). Hinek peyvên ku ji zimanên biyanî hatine, ji ber tesîra zimanê tirkî ku herfa “q” tê da tine li gorî dengê “k”ya qalind a tirkan hatiye nivîsîn. Wek mînak “park” bûye parq, “otopark” bûye otoparq, “kirê” bûye kîra û hwd. (r. 56). Pîle/derece wek pîle hatiye nivîsîn (r.57). Di bêjeya “ceribandin”ê da “n”yek zêde ye, ceribandin (r.75). Bi wateya pijandinê li cihê birjandinê “bijartin” hatiye nivîsîn (r. 83). Ev hemû di sitûna kurmancî da ne.

Meriv kare bibêje ku Ferhenga Pîrzimanî bi her awayî berhemek gelek sûdewer e. Kesên ku təkiliya wan bi ferheng û fêrbûna zimanan ra hebe divê di pirtûkxaneyê wan da ev ferheng cihê xwe bigire. Li me jî gotin, me di kitêbxaneyê xwe da cihê daye vê berhema giranbiha.